



**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

**DI SERDEMA MODERN DE WÊJEYA MODERN  
YA KURDÎ Û DI ÇARÇOVEYA WÊJEYA KURDÎ  
YA MODERN DE MODERNÎZMA  
DERENGMA YÎ**

**Hasan KOCAHAL**

**13721093**

**Şewîrmend**

**Zülküf ERGÜN**

**MÊRDÎN 2018**

**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

**DI SERDEMA MODERN DE WÊJEYA MODERN  
YA KURDÎ Û DI ÇARÇOVEYA WÊJEYA KURDÎ  
YA MODERN DE MODERNÎZMA  
DERENGMAYÎ**

**Hasan KOCAHAL**

**13721093**

**Şewirmend**

**Zülküf ERGÜN**

**MÊRDÎN 2018**

## KURTE

Ev xebat dê rêça tekiliya di navbera modernîzm û wêje, ziman û çandê de bişopîne. Di heman demê de, dê di dema damezrandina netewe-dewletan de rola wêje, helbest, nivîs, nivîskar, xebatên filolojiye binirxîne. Di vê çarçoveyê de ev xebat li ser wêjeya kurdî ya serdema modern disekine. Ev xebat dê li bersiva pirsê ji modernîzma kurdî pêwîste çî bê fêmkirin bigere.

Wêje, di derbarê pirsgerêkên civakê de agahiyan dide. Her çiqas ku ev agahî, bûyeran ne wek xwe nîşan bidin jî, bi şîroveyên nivîskar di derbarê bûyeran de agahiyên girîng tên bidestxistin.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de destpêkirina serdema modernîzmê û pênaseya çend pêyvên ku girêdayî modernîzmê ne hatin vegotin. Di beşa duyem de bandora wêjeyê li ser avakirina neteweyan û damezrandina netewe-dewletan de bi çend mînakên hat lêkolînkirin. Di beşa sêyem de destpêka wêjeya modern a kurdî û çend mînakên ku bi bandor hatin vegotin. Dîsa di beşa sêyem de li ser modernîzma kurdî ya derengmayî hate sekinîn û sedemên modernîzma derengmayî ya kurdî hatin nirxandin. Di encama xebatê de bi awayekî giştî modernîzm û modernîzma derengmayî hat nirxandin û analîzek li ser derengmayîna modernîzma kurdî û bandora wê ya li ser kurdan hat kirin.

**Bêjeyên Sereke:** Modernîzm, wêjeya kurdî, modernîzma derengmayî, helbest, netewe

## ÖZET

Bu çalışmanın amacı modernizm ile edebiyat, dil ve kültür arasındaki ilişkiyi, modernizmin, yazının, edebiyatın, şiirin, dil çalışmalarının ulus-devlet inşasında, milli kimlik oluşumunda ve toplumun modernleşmesindeki rolünü irdelemektir. Bu bağlamda modern Kürt edebiyatının ortaya çıkışı ve Kürt toplumunu dönüştürmede modern Kürt edebiyatının rolünü irdelemektedir. Bununla birlikte Kürt modernleşmesinin gecikmiş bir modernlik olup olmadığı ve Kürt modernizminde ne anlaşılması gerektiği sorunsalı üzerinde durmaktadır.

Çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Birinci Bölümde modernizmin ortaya çıkışı ve modernizmden ne kastedildiği, modernizm sonucu ortaya çıkan bir kısım kavramın irdelenmesi ele alınmıştır. İkinci bölümde modernizmin ve modern edebiyatın özellikleri ve genel olarak toplumların milli kimliklerinin oluşumunda ulus-devlet inşasında ne tür bir rol oynadığı birkaç örnek üzerinden değerlendirilerek ele alınmıştır. Üçüncü bölümde Kürt edebiyatının modern döneme geçişi ele alınmış ve modern Kürt edebiyatının önemli dönemleri bu döneme bazı ait örnek şahsiyet ve çalışmaları değerlendirilmiş ve Kürt modernleşmesine katkıları ele alınmıştır. Yine üçüncü bölümde Kürt modernleşmesi ve gecikmiş modernizm ilintisi ele alınmış ve sebepleri irdelenmiştir.

**Anahtar Sözcükler:** Modernizm, Kürt edebiyatı, gecikmiş modernizm, şiir, ulus

## KURTEBÊJE

**bnr.** : binêrin

**hwd.** : her wekî din

**r.** : rûpel

**b.** : berg

**h.** : hejmar

**ed.** : edîtor

**wer.** : werger

## PÊŞGOTIN

Di dîroka mirovantiyê de hinek serdem hene ku bextê civak û mirovantiyê pê tete guhertin. Çawa ku bi serdema îcatkirina nivîsê serdemeke nû dest pê kir û jiyana mirovantiyê hate guhertin, Bi serdema hilweşîna feodalîteya ku girêdayî çandiniyê bû, serdemeke nû bi navê ronîbûnê destpêkir. Ev serdem li parzemîne Ewrûpayê derket holê. Bi destpêkirina serdemê di hemî waran de guhertinan destpê kir û jiyana civakê hêdî hêdî hat guherîn. Ev serdema nû di demeke kurt de bandor li ser gelek neteweyan kir û li cîhanê belav bû. Tiştê ku vê serdemê bi xwere anî bû yek jê modernîzm bû. Modernîzm, pergaleke nû ya polîtîk-siyasî, wêjeyî, çandî, hunerî bû. Jiyan bi temamî ji tiştên kevn, ji kevneşopiyê dûr diket û di bin bandora olê xilas dibû. Lê di avakirina vê jiyana nû de rola herî giran û girîng li ser wêjeyê bû. Wêjeya jiyana nû hem bi teşe û metoda xwe û hem jî bi mijara xwe hatibû guhertin. Di vê serdemê de fikra neteweperweriyê geş bû û damezrandina netewe-dewletan destpêkir. Împaratorî perçe dibûn û neteweperwerî û netewe-dewletbûn ket rojeva civakê. Ji bo ku ev fikra nû di bazara civakê de cî bigre wêje roleke pir bi qîmet lîst. Fikrên îttîfaqa netewî, çanda netewî, zîmanê netewî yekitiya netewî ancax bi wêjeyê netewî pêkan bû. Modernîzm bi riya wêjeyê dihat naskirin. Wejeyê modernîzmê hat afirandin.

Çawa ku modernîzmê li ser neteweyan bandor dikir, li ser neteweyên ku di bin desthilatdariya Împaratoriya Osmaniyan de dijîyan jî bandor dikir. Di serî de hinek neteweyên Balkanî serî hildan û ji Împaratoriye veqetîyan. Piştî ku hestên neteweperweriyê di nav pêkhatyên Osmanî de belav bûn perçebûna Împaratoriye jî destpê kir. Kurd jî neteweyek ji pêkhatyên Osmanî bûn. Kurdan jî xwest serxwebûna xwe dest bixin. Lê bi ser neketin. Di vê demê de kurdan jî bi riya wêjeyê dest bi hişyarkirina gel kir. Lê piştî Peymana Lozanê rewş bo kurdan hat guhertin. Hewldana rewşenbîran têrê nekir û kurd li çar welatan di bin çar pergalên cuda de bîndest man. Dîsa jî hewldana kurdan nese kinî û kar û xebatên xwe li xerîbiyê û li sirgûniyê berdewam kirin. Lê wêjeya kurdan tu bandor li ser civaka kurdan nedikir. Ji ber ku modernîzma serdestan modernîzma kurdan difetisand. Bi qedexekirina zîman û qedexekirina rêxistinîbûnê modernîzma kurdan pêknedihat.

Tê zanîn ku heke zimanek nebû zîmanê perwerdeyê û zanistê ew ziman pêşnakeve û berhemên ku bi wî zimanî hatine hilberandin jî tu feydê nade wî neteweyî. Di vê xebatê de em li ser sedemên modernîzma derengmayîna kurdî sekinîn. Xebata me ji sê beşan pêk hat. Ji bo xebatê gelek çavkanî hatin lêkolînkirin. Bi mînakan xebat hat dewlemendkirin. Nêrîn hatin dahûrandin. Me xwest ku nêrînên di warê wêjeya modern û bi taybet wêjeya modern ya kurdî û modernîzma derengmayî ya kurdî de binirxînin. Li ser sedemên modernîzma derengmayî analîz û lêkolîn hatin kirin. Hêvî dikim ku xebatên di vî warî de zêde bibin û ev xebat bibin sedema hişyarbûn û ronîbûnê.

Di dema xebatê de spasiya hevalên ku alikariya min kirin û spasiya şêwirmendê xwe dikim ku ji bo xebateke bi rêkûpêk û akademîk rê û rêzik li pêşiya min danîn.

Hasan KOCAHAL

Mêrdîn 2018

## NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET .....	II
KURTEBÊJE.....	III
PÊŞGOTIN .....	IV
NAVEROK .....	VI
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEMÎN

1. MODERN, MODERNÎZM, MODERNÎTE.....	3
1.1. Modern.....	3
1.2. Modernîte.....	3
1.3. Modernîzm .....	4
1.4. Taybetmendiye Wêjeya Modern.....	4
1.4.1. Honaka di modernîzmê de .....	5
1.4.2 Hêma û nîgaşa di modernîzmê de .....	6
1.4.3. Elîtîzm (Bijarteparêz)a modernîzmê .....	6

## BEŞA DUYEMÎN

2. DI DEMA ÎNŞAKIRINA NETEWE- DEWLETAN DE BANDORA MODERNÎZMÊ LI SER WÊJEYA NETEWÎ.....	7
2.1. Wêje- Çand- Netewe –Nasname û Modernîzm.....	7

## BEŞA SÊYEMÎN

3. DI SERDEMA MODERN DE REWŞA WÊJEYA MODERN YA KURDÎ Û MODERNÎZMA DERENGMAYÎ.....	11
3.1. Destpêka Wêjeya Kurdî ya Modern û Taybetmendiya wê.....	11
3.2. Di Beriya Destpêka Wêjeya Modern ya Kurdî de Fikr û Ramanên Neteweyî di Berhemên Ehmedê Xanî de .....	15
3.3. Destpêka Wêjeya Kurdî ya Modern û Hacî Qadirê Koyî.....	18

<b>3.4.</b> Hewldaneke Nû di Wêjeya Kurdî ya Modern de: Ekola Hawarê .....	25
<b>3.5.</b> Wêjeya Modern ya Kurdî di Nav Kurdên Yekitiya Sovyetê de û Riya Teze.....	29
<b>3.6.</b> Rewşa Wêjeya Modern ya Kurdî li Dîasporayê.....	32
<b>3.7.</b> Bi Nêrîneke Giştî Rewşa Îro ya Wêjeya Kurdî ya Modern û Modernîzma Kurdî ya Derengmayî .....	35
<b>ENCAM</b> .....	<b>41</b>
<b>ÇAVKANÎ</b> .....	<b>44</b>

## DESTPÊK

Xebatên ku li ser netewperweriyê hatine kirin dide xuyakirin ku wêje, ji bo modernîzebûna civakê û ji bo afirandina zimanekî netewî roleke bêhempa dilîze.

Weke tê zanîn modernîzm, navê pergala nîrxên civakî ya li Ewrûpayê nêzikî di sedsala 17an de derketiye û di domana demê de li cihanê belav bûye. Bi gotineke giştî dijberiya kevneşopiyê û jêbûna wê ye. Li alîkî jî di warê guherandina keseyatî, civakî û veguherandina hemû qadên jiyana polîtîk an jî guherandina wan tîştan e.

Modernîzm, hêza xwe jî ronakbûn û filozofên sedsala 18an distîne, Di modernîzmê de hiş û mirov navend e. Bi kurtî modernîzm; ji aliyê fikrî heyama ronakbûnê ve, weke polîtîk bi şoreşa frensî ve û wek aborî jî girêdayî Şoreşa Pîşesaziyê ye. (<https://tr.wikipedia.org/modernite> 2017)

Gorî Gurdilî modernîzm, “wekî tevgera ramanî di nîvê sedsala 19an de li frensayê derdikeve û wekî ramanekê serwer, hebûna xwe domandîye. Sedemên derketina tevgera modernîzmê ew bû ku terzên jiyana rojane ya kevin, kevneşopiya edebî û hunerî û hemû organîzasyonên civakî yên berê, wateya xwe winda kirin û li cihanê divê çandê nû were afirandin, bû. Modernîzm ji felsefeyê heta ekonomiyê, lêpîrsîneke nû diparêze.” (Gurdilî 2016)

Ev xebat dê rêça tekiliya di navbera modernîzebûne û wêje, ziman û çandê bi taybet modernîzma wêjeya kurdî bişopîne. Di heman deme de, dê di dema damezrandina netew-dewletan de rola wêje, helbest, nivîs, nivîskar, xebatên filolojiye binirxîne. Di ve çarçovê de ev xebat li ser wêjeya kurdî ya serdema modern, li ser rewşa wêjeya kurdî ya modern û li ser modernîzma derengmayî disekine.

Wêje, ji ber ku bûyerên civakî nîşan dide hercar bûye amurekî pir girîng. Bi riya wêjeyê, dewsa ku raste rast çavdêriya civakê bê kirin bi behremendîya wêjekar mirov dikare encamên giranbiha werbigire. Bi taybet wêje, di derbare çanda gel ya dîrokî, tekîliyên civakê, bûyerên civakî de derfetên teswîrkirine dixê destê me.

Di navbera wêje û çanda neteweyî de tekîliyek pir balkêş heye. Di hêla Civaknasan ve tê qebûlkirin ku taybetmendiyên ku neteweyan ji hevdu cuda dikin di heman demê de, unsûrên ku ji bo nîrxandîneke zanistî û fêmkirina wan netewan tîst bi kar anîn in (Çetintaş 2010)

Wêje di derbarê pirsgirekên civakê de agahiyan dide. Her çî qas ku ev agahi, bûyeran ne wek xwe nîşan bidin ji, bi şîroveyên nivîskar di derbarê bûyeran de agahiyên girîng tên bi destxistin.

Di vê xebatê de bi awayekî giştî li ser van tiştan bê sekinîn;

- Di derbarê serdema modernîzmê de lekolîn
- Di derbarê wêjeya serdema modern û taybetmendîya we de lêkolîn
- Di vê çarçovê de di derheqê rewşa wêjeya modern ya kurdî de lêkolîn
- Di encamê de tevî analîzek giştî gerîna li bersiva pirsê “Gelo modernîzma kurdî modernîzmeke derengmayî ye an na?”

Di vê xebatê de em bi pênaseya wateya peyva modern-modernîzmê dest pê dikin û têkiliya modernîzm û wêjeyê dinîrxînîn. Dûv re em dê derbasî wêjeya kurdî û tesîra modernîzmê ya ku li ser wêjeya kurdî kir bisekinin. Bi nêrîneke giştî dê behsa qonaxên wêjeya kurdî bê kirin û bi çend mînakên dê rewşa wêjeya kurdî ya modern were nirxandin. Di vir de me cih da wêjeya kurdî ku li dîaspora derket holê. Helbet gelek nimûne hene ku di vî warî de bîr girtin lê ji ber ku ev nimûneyên ku hatin girtin heta roja îro jî bandora xebata wan li ser wêjeya kurdî ya modern didome.

Tê zanîn ku Koyî hîmê wêjeya kurdî ya modern daniye. Hîna bandora wî li ser wêjeya kurdî ya kurdên Îran û Iraqê pir zêde ye. Rewşenbîrên kurdên vê derê bi şopdariya Koyî berhemên xwe hûnandine.

Di wêjeya modern ya kurdî de cîhe Qonaxa Stenbol-Şamê pir bi qîmet e. Em li ser ekola Hawarê sekinîn û bi çend nimûneyan rola wê di wêjeya modern a kurdî de nirxand.

Her çiqas ku li axa welêt dûr jî bin, bi kar û xebatên xwe yê di warê wêjeya kurdî de kurdên Sovyeta Kevn gelek berhemên hêja afirandine. Di vî warî de, me rola rojnameya herî jiyandirêj Riya Teze nirxand. Riya Teze nezîkî 80 sal in ku bûye ruhek ji bo kurdên Qafqasyayê. Hê jî ew ruh bi zindî berdewam e.

Kurdên ku ji ber zor û zextan dev ji axa xwe berdan û berê xwe dane xerîbiyê, weke “kurdên dîaspora” jî tî bi nav kirin, li gel zor û zahmetiya penabertiyê ji kar û xebatên xwe yê wêjeyî û siyasî qut nebûn. Bi awayekî giştî em li ser wêjeya kurdî ya modern ya dîasporayê jî sekinîn. Bi mînakeke ku di warê romana kurdî de bi taybet di nav kurdên Tirkiyeyê de deng veda ye me xebata xwe kemiland.

Di encamê de ligel analîzek giştî li ser pirsê modernîzma kurdî ya derengmayî hat sekinin.

Bi hêviya ku ev xebat bibe dilopek alîkari ji bo modernbûna civakê û pêşvebirina wêjeya kurdî ya modern.

## BEŞA YEKEMÎN

### 1. MODERN, MODERNÎZM, MODERNÎTE Û TAYBETMENDIYA WÊJEYA MODERN

**1.1. Modern:** Peyveke frensizî ye. Beranberiya peyvê bi kurdî “hemdem” e. Bi giştî ji bo tiştêkî nû ango ji bo tiştê rojane tê bikaranîn. Weke Îrfan Öztürk aniye ziman têgeha modernê têgeheke herî problematîk e. (Öztürk 2014) Ji ber vê jî bo wateya siyasî, felsefî û ekoleke wêjeyî tê bikaranîn. Netewe-dewletbûn jî bi vê pêyvê re girêdayî ye. Ji ber vê yekê jî bi neteweperweriyê ve jî tê girêdan û weke ku Öztürk ji Eugane Lunn girtî modernîzmê wiha nîşan dide: “Di hunerên cihê cihê de modernîzm, ne vîzyoneke yeker ne jî pratîkeke estetîkî a yekmînakî ye.” (Öztürk 2014)

Peyva “modern” cara ewil bi şiklê “modernus” di dema sedsala 5an de derdikeve pêşiya me. Ev peyv jî ji bo veqetana heyama Mesîhî û heyama Pagan an jî Romayî hatiye bikaranîn. Peyva modern piranî hatiye bi wateya “nû”yê. An jî tiştê ku nû yan niha dest pê kiriye. Wek mînak di wêjeya tirkî de peyva “cedîde” (bi navê Edebîyat-ı Cedîde ekolekî wêjeya tirkî jî heye) ango nû ji bo edebîya nûjen hatiye bi kar anîn

**1.2. Modernîte:** Wateya ferhengî ya modernîteyê, “nûjenî”, “rewşa nû” ye. Ev wate di warê jiyana, felsefe, aborî û civakî de dibe navê guherînên mezin li Ewrûpayê.

Têgiheke ku li Rojavayê Ewrûpayê derketî ye. Wek têgiheke ku di warê civakî, aborî, siyasî-polîtîk de tê pênasekirin e. Di vir de em karin bêjin ku modernîte guherandina jiyana civakî, aborî û polîtîk-siyasî ye. Bi destê modernîteyê pişesazî, bajar, kapîtalîzm, jiyana burjûwazîyê, sekûlerî, demokratîkbûn û yasa danînên komeleyî bi hêz dibin. (Turhanoglu 2016, 9)

Modernîte li gorî Anthony Giddens bi çar saziyên bingêhîn tê naskirin. Kapîtalîzm, Pişesazîbûn, Amûrên kontrolkirinê (bi taybet kontrolkirina çalakîyên siyasî) û kontrolkirina hêzên leşkerî û tundutiyê. (Turhanoglu 2016, 9)

Cudahiyê serdema modernîte û ya berî modernîteyê jî, fikra netewe-dewletbûnê ye ku wan serdeman bi awayekî radîkal ji hevdu vediqetîne.

**1.3.Modernîzm:** Beranberiya peyvê bi kurdî, nûjenparezî ye. Piştî Şoreşa frensizî li Ewropayê di warê zanist, ramyarî û çandê de pêşketin çêbûn. Bi şoreşa pîşesaziyê re di civakên Ewropî de gelek guhertinên civakî çêbûn. Ev peyv ji bo levkirina van guhertinan hat bikar anîn. Piştî van guhertinan metodên kevneşopî hatin berdan û bi metodên nû berhem hatin derhênan.

Modernîzm, wek mêjûyî di sedsala 18an de digel geşedanên zanîstî û ramanî derketiye holê. Modernîzm ji bo wêjeyê têgeheke estetîst e. Armanç bi tenê “huner” e. Modernîte, serdestiya “mêjî” ye, “hiş” e. Mejiyê, digêjîne têgiha “geşedan” û “azadiyê”

Têgîna modernîzmeyê bi modernîteyê re peywendîdar e. Lê cudahiya wê ji modernîteyê yek jê ewe ku tevgereke ku di dawiya sedsala 19an de derketî ye ya dinê jî îfadekirina guhertinên ku bi bandora fikra modern bi taybet di warê çand û henerê de li ser wêje, helbest, mûzîk, wênesazî, avahîsazî derketine holê ye. (Turhanoglu 2016, 10)

Alan dibêje cara pêşî modernîzm bi wateyek erenî ji aliye Rubên Dario ve wek “nûbûneke estetîstîkî ya berfireh” (Alan 2015, 62) hatiye pênasekirin

Divê bê gotin ku modernîzebûyîn pevajoya ku armanca wê, pêk anîna projeya modernîteyê ye. Ango modernîzm, wateya pevajoya civakên kevneşopî an civakên berî serdema modernîzmê veguherandina bi ser civakeke modernîst e. Ev modeleke nû ye. Welatên ku pîşesaziya xwe pêşxistin di warê civakî, sîyasî û çandê de ev modela nû pêk anîn.

Car bi car têgîna modernîzm û modernîteyê di dewsa hevdu de jî tê bi kar anîn. Lê wekî ku me got modernîzm bi wateya guhertinên di warê çand û hunerê de tîpîk pênase kirin. Modernîte jî pevajoya pergala hizrî ya guherandina felsefî-sîyasî, civakî ya wan tiştan e.

#### **1.4. Taybetmendiya Wêjeya Modern**

Di wêjeya modern de hinek taybetmendiya wê hene ku ev taybetmendî ji taybetmendiya serdema beriya modernîzmê cudatir in. Di wêjeya nû de teknîka montaj-kolaj (jêwergiran), rastkirina teşe-honaksazî, rêwîtiya bîr û hişê, afirandina gerdûneke nû heye. Sêbareya duh-îro-sibê ji holê radibe. Fikra estetîka mîmesîs (teqlîda xwezayê) bi dawî dibe. Dinya wekî ku bûye na, bi parçeyên rastiye ve, ji nû

ve tèn afirandin. Realîzm li pêş e. Rêza bûyerê, bi awayekî herikbar nayê vegotin. Hunermend parçeyên rastiye ji xewnên xwe digire, derdixe li ser fetlokên hişê/binehişê û şêwe dide wan malzemeyan. Lîstikeke ku li ser honak/teknîk/sazî tèn lîstin. Tiştên tèn vegotin mecbûr nîne ku li hev rastiya wêneyî û dîrokî bike. Paradîgma bi temamî tê guhertin.

Beriya sedsala 20î wêjeya modern bi vî rengî xuya dikir; Dinyayeke nêzikî dinyaya me hebû. Sêbareya duh-îro-sibê hebû. Honaka hîmî, vegotina naverokê bû. Têkiliya sedem-encamê hebû. Saziyeke bisînor hebû. Lê piştî sedsala 20î wêjeya modern hat guherîn û mijar bû zanîst-teknolojî, qezenckirina diravan, prestîj, ji xwezayê û hawirdorê re beyanîbûn derket holê.

Di modernîzmê de sînorên navbera dinyaya mirov û dinyaya derve namîne. Dem, di hişê me de li ser xetekê naherike. Li hiş û binehiş de dem hildipeke. Teknîka herîkîna hiş û teknîka paşdeveger tèn bikar anîn.

Dema ku em li ferqa navbera wêjeya modern û ya berî vê serdemê dinêrin em dibinin ku hinek tişt di wêjeya modern de hatine guhertin an jî hinek tişt bi wêjeya modern re zede bû ne. Weke ku Remezan Alan jî diyar kiriye tiştê herî sereke: Takekesî, psîkolojî, realizm, dîroka însanê ji rêzê ne. (Alan 2015, 61)

#### **1.4.1. Honaka di modernîzmê de**

Di modernîzmê de du cure honak hene;

- Pevgihandina giravokên metnên ji hev cuda. Joyce (Yên Dublînê), Oğuz Atay (Yên ku xwe ranegirtine.) ji vê cureyê re mînak in.
- Honandina wekî ku çîrokeke tevayî hebe: Metn, li dûrî mentiqê diherike. Saziya metnê li hundir, di rastiya wateyê de tèn xerakirin.

Her du honak, serpêhatiya honakê ye, ne ya bûyerê ye. Armanc, ne nivîsana romanê ye, armanc honandina romanê ye. Di romanên kevneşopî de dema ku em wate, çîrok an jî lehengekê derxînin, berhem xera dibe. Lê di modernîzmê de ev terz wek hev e. Wekî helbestê ye. Şêwe an jî teşe hin girîng e. (<https://ku.wikipedia.org>, modernîzm 2015)

#### **1.4.2. Hêma û Xewn û Xeyal di Modernîzmê de**

Di metnên modernîst de wate dikeve tengiyê, ev jî teknîkeke honakê ye. Teknîka optîk a pîralî tê bikaranîn, ango bûyer yek e, lê vebêjer pir in. Ji aliyê wateyê ve, wate tê parçekirin, giravokên ku metnê çêdikin û vê berevajî dikin. Hêma, cihekî girîng digire. Li gorî wan, wêje bi awayekî wekî din vegotin e. Em dikarin bibêjin efsûna gotinê heye hinekî bi sihr e. Alegorî, nîşane, bibîrxistin, nîgaş ango xewn-xeyal taybetiyên berhemên modern in. Hêma bi pey hev in. Wêjeya modernîst de teknîka honakê hem pir wateyî ye hem jî pir bi tebeqe ye. Di metnan de teknîkên sêwirîya teşeguherîn û întertextual tîn bikaranîn. (<https://ku.wikipedia.org>, modernizm 2015)

#### **1.4.3. Elîfîzma (Bijarteparêz) Modernîzmê**

Ji bo nivîskarekî modernîst, ji hûnerê girîngtir tiştek tune ye. Nietzsche wiha dibêje: “jiyan bi tenê ji warê estefîkê de lê bê nêrîn, watedar dibe.” Xwendevan, xwe di nav lîstikên şeweyê de winda dike.. Ji nav xwendevanan de hêjmareke kêr vê wêjeyê dixwînin. Modernîzm gazî xwendevanên elît (bijarti) dike.” (<https://ku.wikipedia.org>, modernizm 2015)

## BEŞA DUYEMÎN

### 2. DI DEMA ÎNŞAKIRINA NETEWE- DEWLETAN DE BANDORA MODERNÎZMÊ LI SER WÊJEYA NETEWÎ

#### 2.1. Wêje- Çand- Netewe – Nasname û Modernîzm

Wêje yekitiyeke netewî, çandêke netewî û nasnameke netewî pêk tîne. Bi rastî wêje ji bo ku netewe pêşbikeve û bibe xwedî çandêke hevbeş ya netewî roleke pîr girîng dilîze.

Weke ku Jusdanis jî aniye ziman “bi rastî di serdemên destpekî de di çandên netewî de ruhekî wêjeyî heye.” (Jusdanis 1998, 9) di însakirina netew û damezrandina netewan de rolekî wêjeyê yê girîng heye. Her çiqas ku di destpêke de armanceke îdeolojîk ya wêjeyê tunebe jî di domana demê de bûye amureke lihevkerina civakî ya îdeolojîk.

Neteweyên ku hîn yekîtiya xwe û netewebûna xwe bi temamî çenekirine bi gotineke giştî di bin desthilatdariya neteweyên dîtîr de ne û di warê çand, wêje û folklorê netewî de nepêşketî ne. Ji ber ku “serdest” her tim çanda xwe, folklorê xwe û wêjeya xwe li ser wan netewan ferz dike. Ew kêmetew an jî netewên bindest jî, ji bo ku çanda xwe, folklorê xwe û wêjeya xwe wînda nekin li ber xwe didin.

Car bi car modernbûn û rojavayîbûn tê tevlihevkerin. Helbet di navbera modernbûn û rojavabûyînê de tekiliyek heye. Le hinek netewên Rojava (Ewrûpî) hene ku hin ne modern in. Bi giranî modernîzm bi saya wêjeye pêşketiye. Wekî ku li jor hat behskirin, bo însakirina netewekê, wêje rolekî girîng dilîst.

Rewşenbîrên yewnana kevn jî wisa difikirîn. Wan digot modernbûn û rojavayîbûn wek hev e. (Jusdanis 1998, 12) Di vî wari de modernbûna yewnanê minakeke balkêş e. Yewnaniyan hewl dida ku ji bin bandora Osmaniyan de xilas bibin û berê xwe bidin rojavaya ewrupayê. (Jusdanis 1998, 10) Lê dîsa jî li gorî Jusdanis modernbûna yewnane modernîzmeke “kêm” e.

Ji ber ku modernîzma yewnane modernîzmeke ke îthalkirî bû, û yewnanî ji şewaza jiyana rojavaya Ewropayê bi guman bûn. (Jusdanis 1998, 11) Jusdanis dibêje heke kêmasiyek hebe ev ne kêmasiya tunebûna modernîzmeyê ye. Ev kêmasî,

kêmasiya îhmalkirina dema ku modernîzm hate îthal kirin şert û mercên herêma li ber çavan nehatine girtinê bu. (Jusdanis 1998, 12)

Di derbarê moderbûnê de welatê Kanadayê jî mîna keke baş e. Heya demeke direj welatê Kanadayê di bin desthilatdariya Îngilistan û Emrîkayê de bû. Ji ber ku di bin bandora wan devletan de derkeve, ji bo yekîtiyê, hewlên avakirina saziyen çandî dan. Ji bo geşkirina çanda Kanadayê foneka darayî hat saz kirin.

Jusdanis dibêje “çand, ji ber ku parastina yekîtiya neteweyî dike ji bo modernistbûnê pir girîng e.” (Jusdanis 1998, 13) Le ji bo Elmanyayê modernîzm, bi afirandina çanda wêjeyê netewî dest pê kir. (Jusdanis 1998, 13)

Modernîzma yewnanê ji bo welatên Balqanan jî minakek bû. Herçiqas ku çanda yewnanê çandeke dîrokî ye jî, di bin desthilatdariya Osmaniyan de dijîyan. Modernîzma yewnanan bi serxwebûna yewnanê dest pê kir. Yewnaniyan desthilatdariya Osmaniyan bi cahilî, zordestî û bi koletiyê bi nav dikirin. (Jusdanis 1998, 48) Li gorî rewşenbîrên yewnanan jiyana di bin baskên Osmaniyan de çand û zanista yewnanî ji holê radikir. Heke dîsa bixwazin bibin xwedî çand û zanistê, pewist bû ku serxwebûna milletê yewnanî, bihata ragihandin. Bi nêrîna rewşenbîrên yewnanî çandeke netewî herî kêma bi rêvebiriyê xweser pêwist bû. (Jusdanis 1998, 50) Piştî ku yewnaniyan serxwebûna xwe ragihandin, neteweyên din ên ku di bin desthilatdariya Osmaniyan de jî, hewla serxwebûnê kirin. Weke welatê Misrê, Ermen û hwd...

Moderbûna yewnanê ji modernbûna hinek netewan cudatir e. Li vir jî rola wêjeyê derdikeve pêş. Gelek neteweyên Emrîka ya Latîni berî yewnanê serxwebûna xwe îlan kirin. Arjantîn (1816), Şîlî (1818) Meksîka (1821) û Brezîlyayê (1822). Dema ku ev netew azadbûn hişmendiyê netewî tunebû. Di têkoşîna van netewan de ziman û çanda netewî, ne pîrsgirêkên girîng bûn. Hestên netewperweriyê bi van netewan re piştî ku azad bûn bi pêş ket. (Jusdanis 1998, 67,68)

Lê modernbûna yewnanê piştî ku hişmendiyê netewî bi gel re peyda bû dest pê kir. Ji bo hişmendiyê netewî jî wêje pîr rolekî mezin hebû.

Ji bo ku takekesî veguheze hemwelatîyê, amurên çandî xwedî rolekî girîng e. Jusdanis weke ji Gourgouris girtî “*netewe, berî ku li ser xakeke û bi ramiyêyê weke “netew” binav bibe. pêşî weke xevneke peyda dibin*” dibêje, ji bo ve yekê jî pewisti bi damezrandina saziyen hişmendiyên netewî heye. Û wêje, ji van saziyan

yek e. (Jusdanis 1998, 68) Jusdanis dibêje wêje; “eynîka nasnameya hevbeş e û di heman demê de behsa çîroka vê nasnameyê dike.” (Jusdanis 1998, 68)

Di vê astê de zimanên herêmî jî amurekî girîng e ji bo afirandina hişmendiyeke neteweyî. Netewe, li Ewrûpayê, piştî ku zimanên herêmî û zimanên klasik bî taybet bi zîmane latînî re wekhev hat hesabîn peyda bûn. (Jusdanis 1998, 69) Di vir de gava herî girîng ew e ku zimanekî netewî bê avakirin. Du zimanî (zimanê gel u zîmane dewletê) ji bo yekîtiya neteweyî asteng e. Bona vê yekê, pejiwandina zimanê gel, weke zimanê dewletê û zimanê hînkirinê, nîşana yekparebûna saziyên dewletê û çanda neteweyî ye.

Gotina Yiannis Psikharis pir balkêş e. Psikharis dibêje; “Ji bo ku netewek wek neteweke rasteqîn bê qebûl kirin, du tişt pêwîst in; Yek firehkirina sînorên welêt, yek jî afirandina wêjeya neteweyî” ye. (Jusdanis 1998, 76) Psikharis di vê gotine xwe de ne tenê sînorên erdnigariyê nîşan dide. Ew bi temamî behsa firehkirina sînorên mejûyî dike. Wate ew e ku dibêje, hişmendiyeke kûr û berfireh pêwîst e. Dîsa Psikharis dibêje ; “Ziman û netewe yek e. Têkoşîna ji bo welêt û tekoşîna ji bo ziman yek e. “ (Jusdanis 1998, 76) Di vî warî de hêjayî gotinêye ku wêje rojnivîsa gel e.

Modernîzm bi bandora xwe dikeve dewsa nasnameyên nijadî û olî, û çandêke neteweyî diafirine. Wêje bi metnên ku behsa çîroka netewî dikin, karê hevgirtina netewî ya hemwelatîyan hêsan dike.

Niha bi mînakeke baldar emê li bandora wêjeyê binêrin da ku bi çi rengî civake hişyar dike.

Piştî şerê Osmaniyan û Rûsan (1878) Tirkên ku li welatê Romanyayê dijiya bûn kêmnetew û piraniya xwe wînda kirin. Çetintaş, di gotara xwe de rewşa wan wiha bi lêv dike: “*civaka tirkan ya ku ji serokên xwe bêpar bûn û bê dibistan bûn, mizgeftên wan hatibûn hilweşandin, goristanên wan bûbûn zevî, nasnameya xwe ya çandî, bi nasnameya kevneşopî, bi ziman, û bi olê diparastin. Ji bili vê, tiştê ku nasnameya civakê diparast ew bû ku, bi taybet şevên zivistanan li malan destanên ku bi riya dengbêjan dihatin gotin, helbest û çîrok bûn.*” (Çetintaş 2010)

Di vê gotinê de diyar e ku wêje (çi devkî û çi nivîskî be) di demên tengasiyê de ji bo gel çavkaniyeke parastina nasnameyê ye.

Weke tê zanîn bi modernîzmê, di jiyana civakê de serdemek nû dest pê kir. Çawa ku di warê darayî, zanistî de guhertinên girîng çê bûn, wisa jî di warê wêjeyê

de jî guhertin çêbûn. Li jor me behsa taybetmendiya wêjeya modern kir. Ev guhertinên ku di warê wêjeyê de derketin holê ne tenê di tarz û têşeya wêjeyê de bûn. Bi giranî naveroka wêjeyê bi temamî hate guhertin. Mijaren wêjeyê hatin guhertin. Ji ber ku serdem serdema serxwebûna netewan bû. Pewist bû wêje jî di vî warî de rola xwe bilîsta. Wisa jî bû. Mijara wêjeyê veguherî bi ser netewperestiyê ve û bi ser çanda netewî, zimanê netewî ve. Hemu netewên ku di bin desthilatdaran de bûn, ji bona serxwebûna xwe li ber xwe dan. Vê berxwedanê wêjeyê netewî peyda kir. Wêjeya netewî bi xwe re çandeke netewî, zîmanekî netewî, alayake netewî, helbesteke netewî, roman, çîrok û destaneke netewî anî.

Li jor me behsa hinek neteweyên ku di bin desthilatan de dijiyan kir. Heya ku ew netew azad nebûn pêşketina wan ya netewî dest pê nekiribû.

Herçiqas ku Împaratoriya Osmanî nasnameya xwe ya tirk heba jî zîmanekî hevbeş yê ku ji erebî, farisî û tirkî pêk dihat zîmanê fermî yê împaratoriyê bû. Piştî ku tevgerên netewperwerî dest pê kirin împaratorî ber bi belavbûnê ve çû. Her neteweya ku di bin desthilatdariya Osmanîyan de dijiya gaziya serxwebûna netewa xwe dikir. Tiştê herî balkêş ew bû ku Tirkan jî dixwest ku ji vê rewşa nû ya modernîzmê sûdê werbigirin û dest bi propagandayê netewî kirin.

Di vî warî de sazî avakirin û rewşenbîrên Tirk dest bi nivîsên ku bi rengên netewî dagirtî kirin. Li vir jî em dibin ku wêje ket holê. Rewşa xakparastin û afirandina fikra neteweke ku bê îşakirin gîhîşt astekê ku wêjeyê bi navê “Millî Edebîyat” (Wêjeya Netewî) hat afirandin.

Di dema ku Împaratoriya Osmanî hildiweşî de kurd jî weke netewên din pêkhatyek ji pêkhatyên Osmanî bûn. Dema ku tevgera serxwebûna netewan piştî şoreşa frensî destpê kir, modernîzmê di vî warî de piştgirî da rewşenbîran.

Rewşenbîrên kurd jî xwestin ku weke her netewekê xwedî li çanda xwe ya netewî, zimane xwe, xaka xwe û rêvebiriya xwe derkevin.

Ji vir û şûnde di warê wêjeya kurdî de qonaxekê nû dest pê dîke.

## BEŞA SEYEMÎN

### 3. DI SERDEMA MODERN DE REWŞA WÊJEYA MODERN A KURDÎ Û MODERNÎZMA DERENGMAYÎ

#### 3.1 Destpêka Wêjeya Kurdî ya Modern û Taybetmendiyan Wê

Wêjeya kurdî ya modern, bêtir roman, kurteçîrok, helbesta serbest, şanoyên ku van salên dawîn hatine nivîsîn, tîne bîra mirov. Lê wekî her tiştî, edebiyata kurdî ya modern jî xwediyê rabirdûyeke kevn e. Em dikarin bibêjin ku emrê vê kevinbûnê zêdeyî sed salî ye. Pîsporên ku li ser wêjeya kurdî ya modern dixebitin Destpêka wêjeya kurdî ya modern bi Hacî Qadirê Koyî dest pê dikin. Wêjeya kurdî, wêjeyeke balkêş e, rengîn e. Û rengvedaneke rewşa kurdan e.

Wêjeya kurdî ya modern her wiha bi polîtîkayê ve girêdayî ye. Û bi rewşa siyasî ya kurdan ve girêdayî ye. Îhtîmaleke ku li tu aliyê dinyayê edebîyatek tune ye ku wek wêjeya kurdî bi sîyasetê ve girêdayî be. (Uzun 1992, 5)

Cara yekem xaka kurdan bi peymanê Qesra Şêrîn bû du parçe. Bi vê parçebûnê jiyana civakî, siyasî û çandî pir bi paş ket. Şairê bi nav û deng Ehmedê Xanî vê rewşê di berhema xwe ya giran biha “Mem û Zînê” de wiha tîne ziman.

Bifikir ji Erab heta ve Gurcan

Kurmanc çî bûye siphê bircan

Ev Rûm û Ecem van hesar in

Her du terafan qabilên Kurmanc

Bo tîrê qeza kirine armanc (Uzun 1992, 7)

Pîştî Xanî em dibînin ku şopdarê Xanî Hacî Qadirê Koyî jî di derbarê wê peymanê xedar de wiha dibêje:

Li mabeynî killavsûr û killawreş

Perêşan in diyarin mîslî gay beş (Koyî 2004, 150)

Di dûv parçebûna yekem re careke din xaka kurdan parçe bû. Bi peymanê Lozanê ya ku di sala 1923an li Lozanê hate îmze kirin xaka kurdan bû çar parçe. Kurd ji hev dûr ketin. Kurd him bêmaf man û him jî xaka wan parçe bibû. Dema ku yek li ser wêjeya kurdî bisekinê dê bibine ku wêjeya kurdan wêjeya man û nemanê ye.

Berî ku xaka kurdan parçe bibe an bi gotineke din beriya ku modernîzma ku alîkariya serxwebûna netewan dikir, (beriya şoreşa frensî) rewşenbîrên kurd berhemên xwe bi awayekî klasîk dinîvîsandin. Wêjeya kurdî ya klasîk di warê hilberandina berhemên de pir dewlemend e. Ji ber ku yekîtîya kurdan hebû û dewlemendiya kurdan di nav kurdan de dima. Nêzîkî hezar salî di derbarê nivîskariya kurdî de rewş gelekî baş bû. Ji ber vê yekê wêjeya kurdî ya modern wek wêjeya klasîk a kurdî pêşneket.

Ji ber şert û mercên siyasî û civakî piştî parçebûna xaka kurdan di warê wêjeyê de hejînek çêbû. Rewşeke dijwar li pêşîya rewşenbîrên kurd hebû. Gelek zahmetî li ber zimanê kurdî hebûn. Ji ber van astengiyan rewşenbîrên kurd û wêjeya kurdî di rewşeke nebaş de man. Ji ber parçebûnê hinek astengiyên berçav hebûn. Di serî de kurd parçe bibûn u li her parçeyekî ku kurd lê dijîyan alfabeyek cuda bikar dihat. Li Tirkîye latînî, Li Iraq, Sûriye û Iranê erebî, û li Yekîtîya Sovyetê elfebeya kirilî bi kar dihat. Ev yek bi tena serê xwe ji hev qutkirina rewşenbîrên kurd bû. Û civaka kurd jî ji hev dur dixist. Haya kurdekî ji kurdekî hêla din tûne bû. Vê yekê nedihîşt ku rewşenbîrên kurd danûstandinê bikin. Mixabin kurdên ku li Tirkîyê dijîyan bi kirilî û erebî nedizanîn, û yên Iraq-Îran-Sûriye û yên yekîtîya Sovyetê ji nikarîbûn ku bi Latînî bixwînin.

Ev rewş bi rastî jî li ber wêjeya kurdî ya modern û moderbûna civaka kurd jî astengek pir xedar bû. Şert û mercên kurdan jî gorî welatê ku lê dijîyan cûda bûn. Kurd li çar parçeyan di bin desthilatdariya şert û mercên siyasî û civakî yên cûda cûda bûn. Çand û zimanên welatên desthilatdar li ser kurdan ferz bûbû. Kurdên ku li Iraq û Yekîtîya Sovyetê dijîyan gorî kurdên ku li Tirkîyeyê, Îran û Sûriye dijîyan rehetir bûn. Li Tirkîyeyê, Sûriye û Îranê zimanê kurdî, çî bi devkî be çî bi nivîskî be heya dawîya sedsala 20an jî qedexe bû. Tenê li Iraqê qet tu caran zimanê kurdî qedexe nebûye. Ji ber vê yekê wêjeya kurdî ya modern li parçeya Iraqê pêşketîtir e.

Weke ku me li jor behs kir, ziman ji bo hişmendiyeke netewî amûrekî pir girîng e. Ji ber ku girîngiya zimên dihat zanîn bi destê serdestan li ser zimên qedexê çêdibûn. Ji ber zor û zordariyê, zimanê kurdî li ber tehlikeya windabûnê jî maye. Di vê astê de medreseyên kurdan, ji bo parastina zîmanê kurdî rolekî pir bi qîmet lîstine. Ji ber van zor û zordariyan wêjeya devkî ya kurdî ji ya nivîskî pêştir e. Parçebûn û dijwarî û zordariya ku li dora wêjeya kurdî, rê li pêşketina wêjeya kurdî girtiye.

Wêjeya kurdî ya modern bi gotineke giştî di sê qonaxan de tê nirxandin.

\*Qonaxa Stenbol-Şam

\*Qonaxa Silêmanî (Iraq)

\*Qonaxa Yekitiya Sovyetê.

Kurdên ku li welatên ji hev cuda dijîyan heya wan ji hevdu nebû. Wêjeya her cîhekî ji bo wan kurdan ku li wir dijîyan. Heya salên dawî jî rewş bi vî rengî bû. Piştî salên 1970an dîwarê îzolasyonê hêdî hêdî hilweşiya û fersend ket destê kurdan ku hevdu nas bikin û berhemên hevdu bixwînin.

Qonaxa Stenbol û Şamê girêdayî hevdu bû. Kurdên ku piştî ku Komara Tirkî ava bû ji ber zor û zordariyê koçî Sûriye kirin û karen xwe yê rewşenbîrî li Sûriye berdewam kirin. Em dikarin bibêjin qonaxa Stenbol-Şamê qonaxa sirgûniyê ye jî.

Li vir divê em behsa qonaxeke din ji bilî sê qonaxan jî bikin. Ew jî qonaxa sirgûnê an dîaspora bû. Cara yekem rojnameyek bi navê “Kurdistan” Li derveyî sînorên xaka kurdan di sala 1898an de li bajarê Qahîre hat weşandin. Xeynî vê yekê gelek bajar ji bo kurdan bûne cîhê sirgûnê weke Şam, Beyrut, Qahîre, Bexda, bajarên welatên Ewropî u hwd...

Sirgûn her çiqas ku jiyaneke zor û zahmet e jî, ji bo kurdên ku li sirgûnê nêzîkî hev bûn û hevdu nas kirin ji bo wan fersendek pir girîng bû.

Rewşenbîrên kurd bi piranî, ne bi awayekî rêk û pêk karê xwe didomandin. Ji ber ku tê zanîn ku wêje, di wargehên perwerdehî de dê pêşbikeve. Lê rewşenbîrên kurd ji van fersendan bêpar bûn. Zîmanek dema ku bû zîmanê zanîst û perwerdeyê wî çaxî dê pêş bikeve û bandoreke erênî li ser wêje û civakê bike.

Qonaxa Stenbol-Şamê di warê wêjeya kurdî ya modern de cîhekî taybet heye. Kurdên ku li Stenbol û Şamê dijîyan bi zaravayê Kurmanciya Jor diaxîfîn. Di warê nivîsê de zaravayê kurdî yê herî kevn û di warê axaftinê de zaravayê herî mezin kurmancî ye. Nimûneyên pêşîn jî bi zaravayê Kurmanciya Jor hatibûn nivîsandin.

Piştî dawiya sersala 19an nivîsandina bi kurmcî dewlemendtir û geştir bû. Hêjayî gotinêye ku ev geşbûn bi weşana rojnameya “Kurdîstan”ê bi pêşket. Bi gotina Mehmet Uzun “Kurdistan” bû çirûska pêşketina nû.

Rojnameya “Kurdistan”ê roja 22 Nîsana 1898an dest bi weşana xwe kir. Ev roj bû ye roja neteweyî ya rojnamegeriya kurdî. Em dibînin ku çawa wêje dibe sedema ji bo avakirina çandê netewî ya hevbeş. Helbet ev roj bi bîranînan û bernameyên ku ji bo wê rojê tê li darxistin bandoreke erênî li ser civaka kurd dîke.

Di dema ku modernîzm tesîrê li ser neteweyên ku di bin desthilatdariya dewleta Osmanî dest pê dîke de kurd jî dikevin bin bandora modernîzmê û bi heman refleksê dest pê dikin. Kar û barên avakirina zimanê neteweyî, ferheng û rêzimana kurdî dest pê dibe. Di heman demê de ji hêla teşe û dirûvê ve jî wêjeya kurdî dest bi xwenûkirinê dîke. Ev serdem wekî Qonaxa Stenbolê jî tê naskirin. Di vê demê de mînakên hêja hene. Wekî ku Öztürk ji behs kiriye “çîroka Fuadê Temo ‘Rojî Kurd’ de hatiye weşandin. Di vê çîrokê de cara yekem qerektêreke ji rêzê ango ji nav gel dibe lehengê çîrokê û wêje bi derd û kulên gel, bi jiyana rojana dadikeve, dibe perçeyê jiyana gel.” (öztürk 2014)

Qonaxa Stenbol-Şamê ji bo kurdan ne tenê bibû qonaxa wêje û çandê. Di heman demê de qonaxa siyasî jî bû. Gelek dezgeh û rêxistinên kurdan li Stenbolê hatibûn damezrandin. Di navbera salên 1900-1920an de di warê wêje, çand û siyaseta kurdî de pêşketinek pir girîng çêbû. “Kurdîstan Azmî Kavî Cemîyetî, Kûrt Teavun ve Terakki Cemîyetî, Hevî Cemîyetî, Kurd Tamîmî Marîf Cemîyetî û Kurdîstan Tealî Cemîyetî” ji wan rêxistinên siyasî bûn. Û “Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Jîn, Kurdistan, Kurd Teavun ve Terakkî Gazetesî” di warê wêje û çandê de kovar û rojnameyên ku dihatin weşandin bûn. Weke Zülküf Ergün anîye ziman hewldanên rewşenbîr û siyasîmedarên kurd negihîştin armanca xwe û di encama şerê Cîhanê yê Yekem de axa kurdan bû çar parçe û di wateya modern de welatê kurdan bi gotina Ergün bû ; *“wêlatekî kolonî û navûnîşanên wê yên dîrokî, civakî û çandî ketin ber pêla qedexê û asîmîlasyona çar dewletên neteweyî yên serdest.”* (Ergün 2015) Piştî ku Komara Tirkiyeyê hat damezrandin, ji bo kurdan dîsan rojên teng, zor û zordariyê detst pê kirin. Gelek rewşenbîrên kurd ji Tirkiyeyê revîyan û çûn Sûriye û xebatên xwe li wir domandin. Di warê karên rewşenbîrî de xebatên rewşenbîrên kurdên ku li Tirkiyê dijiyan bi destpêka salên 1920an de qut bûn. Ew li berxwedana rewşenbîrî ya

ku bandoreke erênî li ser civaka kurd bike hate çilmisandin û bi yekcar winda bû. Kurd bê rewşenbîr u bê rêberên siyasî û civakî man.

Karê rewşenbîrî ku li Stenbolê destpêkirîbû û bi damezrandina Komara nû hat qedexekirin, li Şamê bi destên rewşenbîrên ku ji Tirkiyê reviyabûn dîsa dest pê kir. Bi kar û xebatên Mîr Celadet Bedirxan wêjeya kurdî ya modern hewl da ku karê xwe yê civakî û rewşenbîrî bi cîh bîne. Kovara Hawar (1932-1951), Ronahî (1940) û Roja Nû (1943-1946) di warê parastin û pêşvebirina zîman û wêjeya kurdî alîkariyek bêhempa kir.

Ev xebat gelek bi wate û bi qîmet in, lê mixabin ew xebat di nav civakê de zêde nehatin naskirin. Ji ber gelek sedeman gîhîştina gel û van xebatan pir zehmet bû. Lê ev xebatên giranbiha mîraseke dewlemend ji bo nîfşen pêş de hiştin.

Wekî ku me anî ziman di qonaxa Silêmanî-Iraqê de wêjeya kurdî pêştir bû. Ji ber ku zor û zordestiya welatên serdest li vir kêmbû û zimanê kurdî qet qedexe nebû. Ji ber vê çendê gelek rewşenbîr derketin û gelek berhem hatin nivîsandin. Gelek kovar û rojname hatin weşandin.

Kurdên ku li Yekitiya Sovyetê dijîyan bi şoreşa 1917an gîhîştin mafên xwe yê çandî. Berî îqtîdara Stalîn kurdan li Sovyetê xwendegehên kurdî, rojname, kovarên kurdî ava kirin. Li zaningehan beşên kurdî vebûn. Vê rewşê kir kû gelek nivîskar û berhem li Yekitiya Sovyetê derbikevin. Weke ku emê di risteyên jêr de behs bikin, kurdên Sovyetê ji tîpên latînî elfabeyek pêk anî bûn û dest bi weşana rojnameyê ku bi navê “Riya Teze” kirin. (Uzun 1992, 65,66)

Em dê di vê xebata xwe ya bi sînor de ji her sê qonaxên wêjeya kurdî ya modern de nîmuneyekê binirxînin.

### **3.2. Di Beriya Destpêka Wêjeya Modern Ya Kurdî de Fikr û Ramanên**

#### **Neteweyî di Berhemên Ehmedê Xanî de**

Ehmedê Xanî Bêguman zana û hostayê herî mezin yê wêjeya kurdî ye. Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê “Mem û Zîn”a berhema herî mezin ya klasîka kurdan tê qebûlkirin. (Uzun 1992, 12). Li gel vê qebûlkirinê Ehmedê Xanî weke şairê klasîk di berhemên wî da fikra netewperweriyê pêre heye ku ev jî taybetmendiyeke wêjeya modern e di warê mijarê de. Taybetmendiyeke wêjeya modern ew e ku

mijarên wêjeya modern, bi pirani li ser netewe, çanda netewî, zimanekî netewî disekine. Ev taybetmendî bi rojavayîbûne jî ve giredayî ye. Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bêhempa “Mem û Zîn”ê de ev taybetmendiya wêjeya modern bi kar aniye. Gelo Ehmedê Xanî modernîst bû? Helbet na. Hê di warê wêjeyê de pergala modernîzmê di dema ku Xanî dijiya de tune bû. Girîngiya Shakespear, Cervantes, Fîrdewsî ji bo wêjeya wan gelan çî be, girîngiya Ehmedê Xani jî ji bo wêje, çand û zimanê kurdî ew e.

Celadet Bedîrxan di derheqê fikra Xanî ya ku piştî demekê bi riya modernîzmê bûye mijara wêjeya netewî ya hemû netewan wiha behs dike. *Xanî di wextekî welê de rabû ko be riya niho bi sêsed û neh salan ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hêj li millyet û li nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelumên ji yek miletî hev û dû ji bo ketolîkî an protestaniyê dikuştin. Di heyameke welê de Ehmedê Xani bira miliyeta xwe, bira kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon berî her tiştî kurd in, rabin ser xwe, dewleteke kurdi çekin û bindestiya milletên din mekin” (Hawar, hejmar 8. r.813-814)*

Celadet, dema ku pesnê berhema Xanî ya bi nav û deng dide sembolên netewperweriyê bi zimanekî zelal bi lêv dike û wiha dibêje: “*Mem û Zîn ji bo Ehmedê Xanî remzên Kurdistanê, rêzikên welatê wî ne. “Xanî dibîne ko ew rêzik wînda dibin, kurdmanc bi zimaninê din dixwînin û dinivîsînin, bi rêzikên milletên din ve diçin, belgên xwe ên nijadîn jî xwe tavêjin, dikevin rengê milletên din û bi vî awayî û bi rêva bindestiya wan dikin” (Hawar, hejmar 8. r. 814)* Gelo mijara “Edebîyata Millî” ya tirkî, ya yewnanî, ya frengî û elmanî ne ev bû? Ev ne mijara wêjeya modern bû?

Di dema jiyana Ehmedê Xanî de zimanê wêjeyê û zimanê dîwanê zimanê farisî û erebî bû. Lê Ehmedê Xanî berhema xwe bi zimanê kurdî nivîsîye. Sedema wê jî wiha aniye ziman;

Da xelq-i ne bêjtin ku: Ekrad

Bê ma'rîfetin, bê esl û binyad

Enwaê mîlel xwedan kitêbin

Kurmanc-i tenê di bê hesêbin

Hem ehlê nezer ne bèn ku: Kurmanc  
Işqê ne kirin jibo xwe armanc

Têkda ne di talibm, ne metlûb  
Vêkra ne mihîbbîm ew, ne mehbûb

Bê behrene ew ji îşqebazî  
Farix ji heqîqî-yû mecazî (A. Xanî, 60,62)

Di berhemên Ehmedê Xanî de em fikra ku di wêjeya modern heye dibînîn, lê ji ber ku hîn di berhemên wî de tarz û teşeya wêjeya modern tune ye bi yek car em nikarin bibêjin wêjeya kurdî ya modern bi Xanî destpêkirî ye.

Xanî car bi car bikaranîna bi zimanê kurdî û xweşiya zimanê kurdî aniyê ziman û kurdan teşwîq dike ku bi kurdî bixwînin û binivîsin. Ehmedê Xanî hestên neteweyî, kir parçeyekî jiyana kurdan. (Uzun 1992, 14)

Ehmedê Xanî di berhema xwe de dike ku kurd haya wan ji lehengên kurdan hebin û behsa kesaytî û navdarên kurd dike. Wan bi bîr tîne ku nifşên dûv xwe agahdar bike. Xanî wiha dibêje:

Kurmanc ne pir di bê kemal in  
Emma yetîm û bê mecal in

Fîlcmle ne cahil û nezan in  
Belkî sefîl û bê xudan in

Ger dê hebûya me jî xudanek  
Âlî-keremek, letîfedanek

Îlm û huner û kemal û iz'an  
Şî'r û xezel û kitab û dîwan(.....) (A. Xanî, r.62)

Xanî di derbarê yekîtiya kurdan, îttîfaqa kurdan û xwerêvebirina kurdan de jî nerînên xwe anîne ziman. Ev yek kiriye mijara berhema xwe û wiha dibêje:

Ger dê hebuwa me serf irazek  
Sahibkeremek suxennuwazek,

Neqdê me di bû bi sîkke meskûk  
Ne'dma wehe bê rewac û meşkûk (A. Xanî, r.54)

Ger dê hebûya me ittifaqek  
Vêk ra bikira me inqiyadek

Rûm û 'ereb û 'ecem tamamî  
Hemiyar ji me ra fikir xulamî

Tekmîl fikir me dîn û dewlet  
Tehsîl fikir me 'ilm û hikmet

Temyîz-i dibûn ji hev meqalat  
Mumtaz-i dibûn xwedankemalat (A. Xanî, r.58)

Salên ku Xanî dijiya (1651-1707) hê li Ewropayê modernîzmê dest pê nekiribû. Tevgerên ku bi rengên netewperwerî bi rêk û pêk dest pê nekiribûn. Lê Ehmedê Xanî di sedsala 18an de di weke ku Celadet jî aniye zîman berhêmên xwe de behsa netewperweriyê, ziman û yekitiya gel fikir.

### **3.3. Destpêka Wêjeya Kurdî ya Modern û Hacî Qadirê Koyî**

Me li jor li ser xuyakirina fikrên Ehmedê Xanî yên ku di warê mijarê de di taybetmendiya wêjeya modernde hene çend gotin kirin. Piştî Xanî serdemekî nû dest pê kir di warê wêjeyê de. Ev serdem serdema modernîzmê bû. Bi tarz, teşe, rêzbandî û mijarê serdemek nû bû. Li Ewropayê netew-dewlet ava dibûn. Wêjeyeke bi rengê netewî dest pê dikir. Çanda netewî, zimanê netewî, folklor, dîroka netewî, xakparêzî

ketibû rojeva civakê. Weke ku Jusdanîs dibêje wêje, nivîs; “îro jî li rojhilata navîn, Efrîka û Emrîkaya Latîn li dijî kolonyalîzm û emperyalîzmê hêzeke xurt e” (Jusdanîs 1998, 227) ku li ber çav bê nê girtin.

Rewşenbîrên kurd jî ji vê guhertinê agahdar bûn. Li rojhilata navîn de wê demê Şam û Bexda di warê çand û wêjeyê de zêde ne pêşketî bûn. Stenbol hem paytexta Împaratoriya bû hem jî em dikarin bibêjin paytexta wêje û çandê bû. Di heman demê de Stenbol heya salên 1920an navenda çap û weşanên kurdî bû. Berî îqtîdara Îngîlîzan tu grîngiya Iraqê di derbarê wêje û çanda kurdî tune bû. Dî dema serdestiya Îngîlîstan u piştî Iraqê jî bû navendeke girîng bo çapxane, weşanxane, kovar û rojnameyên kurdî.

Berîya ku Komara Tirkiye bê damezrandin gelek malbatên mezin ên kurdan û gelek rewşenbîr û navdarên kurd li Stenbolê dijiyan. Yek ji wan malbatên mezin, malbata mîr Bedîrxan bû ku wê deme li wir di sirgûniyê de dijiya. Malbatên mezin bi taybet ji bo zarokên malbatê mamosteyên taybet hebûn. Yek ji wan mamosteyên malbata Bedîrxan şairê mezin û şopdarê Xanî û li gora hinek kesan Xaniyê duyem Hacî Qadirê Koyî bû.

Emê hinekî li ser jînegariya Koyî bisekinin û dîvre li ser girîngiya wî di warê wêjeya kurdî ya modern de bisekinin. Her çiqas ku Koyî dawîya jiyana xwe li Stenbolê derbaskiribe jî ew li ser qonaxa wêjeya modern ya kurdî ya Iraqê tê hesibîn. Di vê beşa xebata xwe de emê Koyî wek nimûneya vê qonaxê binirxînin. Ji ber ku Koyî zêde bandora wêjeya wî li ser wêjeya modern ya kurdî ya jêr heye.

Hacî Qadirê Koyî (1815-1897) bi mîladî di 1815an de li gundê Gorqeraçê ku dikeve başûrê rojavayê bajarê Koyê li başûrê Kurdistanê hatiye dine. Hacî Qadirê Koyî, navê wî Qadir yan Evdilqadir kurê mela Ehmed kurê mela Salih kurê mela Ehmed ê mezin e, dayîka wî jî (Fatê=Fatim) e, her wekî di malikeke xwe de dinvîse:

Bawkim Ahmed bû nawî fikrim dê

Xelkî ladê bû daiykî min Fatê (Koyî 2004, 108)

Koyî jî wek helbestvanên Soran, Nalî û Şêx Riza di 1839-1940 an de diçe Stenbolê dikeve nav cîkava wêjekar û helbestvanên Îstanbolê. Gelek helbestvanên kurd yê vê heyamê farisiya xwe li ber destê Koyî xwendine.

Celadet Bedîrxan Koyî wek Xaniyê duyemin binav dike. Di derheqê Koyî de dibêje *“Hacî Qadirê koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê milletê xwe dişewîtî.” Şihîr û qesîdeyên wî tev de Îl ser millet û welêt in.*” (Hawar, hejmar 33, r. 817)

Dîsa bi berdewamî Celadet di derheqê Koyî de wiha dibêje: *“Hacî dîwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî ditiye; bi destnivîseke hûr qedere 800 rûpel hebû. Hacî ji dîwana xwe du nisxe nivîsandi bûn; heke nisxeke wê tirkan şewitandîye heye ko nisxa din rojekê bikeve destên me”* (Hawar, hejmar 33, r.817)

Koyî helbestvanekî şoreşger û welatparêz e. Koyî di helbestên xwe de gelemperî li ser dijîtiya şêx û çîna ruhban û dewletên dagirker nivîsandiye. Êrîş dibir li ser şêxa û li ser vê navbera wî û şêxên Koyê xirav dibe ser vê diçê Stenbolê.

Koyî, di helbestên xwe de êrîş dibir ser çîna ruhban û hewil dida rêya zanistê nîşanî xelkê bide û durûtiya şêxan nişan dida. Wek wê helbesta xwe de:

Şiklî tekeye û xanegahî şêxakan  
Waqî'en rengîne e emma bo rîyan

Lem hemû şêx û murîdenay rîya  
Ferdekî naçête mizgewtî Xuda (Koyî 2004, 115)

Li gorî Koyî, şêx û murîden wan, gel dixapînin û zikrû du'ayên wan qet tiştêki çareser nakin.

Fayîdeyî ger bidaye zikr û du'a  
Debûwe Qarûn gedayî ser rêga (Koyî 2004, 105)

Hacî Qadirê Koyî di helbestên xwe de ne bi tenê dijî şêx û sofîyan derdiçû, belkî ew zêdetir jî dijî dewletên dagirker derdiket û hewl dida ji bo hişyarkirina gelê kurd. Wê dema ku em behsa jiyana Hacî Qadirê Koyî dikin pêwîst e li ser berhemên Hacî, bi taybetî jî li ser helbestên netewî yên Hacî rawestin. Ji ber ku Hacî Qadir jiyana xwe ji bo kurd û Kurdistanê terxan kiribû.

Hacî dixwest ku bi kurdî, li ser kurd û welatê kurdan binivîse, fikra xwe jî li ser vê yekê bi awayekî zelal dida xuya kirin:

Me'lûm e bo çî Hacî medhit deka bi kurdî

Ta kesî nellê: Be kurdî nekirawe medhî barî (Koyî 2004, 58)

Hacî dibêje xeynî kurdan milletên bê pirtûk û nivîsîn li ser rûyê erdê nemane. Wesa jî serinca kurdan dikişîne li ser rewşa aloz ya kurdan. Hacî di vî warî de wiha dibêje:

Her kurde le beynî kullî millet

Bêbehîr e le xwêndin û kîtabet

Bêgane be tercemeyî zubanî

Esrarî kitêbî xellkî zanî

Yekser ulema dirîşt û wîrdî

Naxwênînewe du herfî kurdî

Ustadî xetin le em siyane

Wek dî le zubanî xoy nezan e

Sahîb kutub û peyame herkes

Ême nebê bûyne qewnî çerkes

Kake ême mûmin in ne rûsîn

Boç kîfir e zubanman binûsîn

Milletî bê kitêb û nûsîn

Xeyrî kurdan nîye le rûyî zemîn (Koyî 2004, 156)

Hacî li ser peywendîyên ziman û dîrokê radiweste û nîşan dide ku eger dîroka kurdan bi kurdî bihata nivîsandin, mîr û padeşahên kurdan heta hetayî dijîyan. Ji ber ku îro jî wê dema em bala xwe didin lêkolînên li ser dîroka kurdan gelek tişt nexuyane û pêwîstiya lêkolînên kûr dixwaze. Yek ji sedemên van aloziyan

nenîvîsandina dîroka kevn ya kurdan e. Û negêhiştina belgeyên nivîskî heta roja me ye. Li ser vê mijarê Hacî wiha dibêje:

Kitêb û defter û te'rix û kaxez

Be kurdî ger binûsraye zubanî

Mela û şêx û mîr û padîşaman

Heta mehşer dema naw û nîşanî (Koyî 2004, 60)

Koyî modernîstê kurd ê yekemîn e. Li ba lêkolînerên kurdolojiye modernîteya kurd bi hatina Koyî ya Stenbolê dest pê dike. Di modernîta Koyî de pêşveçûna ilm û fenî heye. Li ba Koyî rojava li aliyên teknîk û fên pêşveçûye ji ber vê yekê niha serbixwe û azad in. Heke em azadiyê bixwazin gerek em jî bi aliye ilm û fennê pêşve herin.

Ehlî japon be fenn û sin'etî çak

Seyrî çon Çînî girt û kirdiye xak (Koyî 2004, 106)

Ew beyt nêrîna Koyî ya li ser modernîzme bi zelalî derdixe ber çavan. Li vir dibêje bi saya ilm û teknîkê neteweke çil milyon (japon) dikare neteweke çarsed milyonî bigirta û wî bikira dîlê xwe.

Modernîteya Koyî ne wek modernîteya rojavaye, her çiqas Koyî demokratîkbûna şêweya jiyana kurd bixwaze jî demokrasiyeke wek ya burjûvayî neafirandiyê. Di Koyî de têgiha mîna serdestiya gel ya Îngilistan, frensa û Emrîkayê hatiye avakirin tune ye. Armanca wî ya bingehîn ne demokrasî ye, lê serxwebûn e. Ji tevgerên Ermenî, Sirp û Bulxaran ên serxwebûnê yên li dijî Osmaniyan îlham digire. Lê qala şoreşên frensî yên di 1789 û 1848an nekiriye. Ji bo kurdan re bibe model behsa serhildana Sudanê (1881) dike. Lê behsa Komîna Parîsê (1871) nake. Ev jî nîşan dide ku Koyî, şoreşa civakî an jî ji serdestiya modern zêdetir tenê bi tevgerên azadiyê re eleqedar dibe. Di vî alî de wek Xanî difikire:

Bulxar û sirb û yonan, hem ermen û qeretax

Her pêncyan be te'dad nabin be qeddî baban

Her êke musteqîll in kullêkî dewlletêk in  
Sahîbî ceşş û rayet, erkanî herb û meydan

Hem heqyene ermen xîretkeşî yektir in.  
Wek ême nîn le gell yek de'wa biken be şîran

Bo fennî herb û sen'et, bo zept û rebtî millet  
Deynêrine Urûpa gewre û biçûkî xoyan. (Koyî 2004, 85-86)

Ji van rêzikan jî diyare ku Koyî serketina van netewan girêdayî bi xîretî, xebat, yekîtî û pêşveçûna teknikî dike. Dibêje ev pênc netewe serhev wake serjimara kurd nabe, lê mixabin ev niha serbixwene lê em hê bindestin, heger em jî bixebitin û li aliyê fen û ilmê Ewrûpa mînak bigirin em ê jî serdest bin.

Her çiqas Koyî di helbestên xwe de behsa fen û ilm û teknîk û pêşketinê bike jî di aliyê rêveberiyê de wek berê difikire. Ji bo rêveberiya Kurdistana serbixwe modela wî mîrekiyên kurda ya feodal e.

Kiwa walîyî Senenduc, begzadey Rewandur  
Kiwa hakimani Baban, mîrî Cizîr û Botan  
.....  
Kiwa ew demey ke kurdan azad û serbexo bûn  
Sultanî mullk û millet, sahîbî ceşş û 'irfan (Koyî 2004, 84)

Rewşenbîrên kurd yên wekî Hacî ditirsiyan ku welatên rojava li ser axa Kurdistanê dewletekî ji bo Ermenîyan saz bikin. Ji bo vê yekê jî Hacî di helbestek xwe de li ser vê mijarê radiweste û wusa dibêje:

Xakî Cizîrî û Botan, yanî willatî kurdan  
Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenîstan  
.....  
Hiç xîretek nemawe sed car qesem be Quran  
Peyda bê Ermenîstan namênê yek le kurdan (Koyî 2004, 83)

Di vê helbestê de jî xuya dibe ku Hacî ditirsîya ku dewleteke Ermenîyan li ser axa Kurdistanê saz bibe, kurd nikarin li Kurdistanê bimînin. Ji bo vê yekê jî Hacî hewl daye bi rêya helbestên xwe ve serinca xelkê Kurdistanê bikêşîne li ser rewşa aloz ya wê demê. Remezan Alan li ser vê helbesta Koyî dibêje:

"Ew di vê helbestê de rexne li tembelî, li ser rewşa wê demê ya kurdan dike. Ew pêşengê edebiyata kurdî ye. Ew bi vê helbestê dikare bibe pêşengê edebiyata kurdî. Ev helbest wekî keşkulê ye, her tişt têde heye." Alan bi berdewamî dibêje "Koyî hay ji Şoreşa frensîzi heye, çapemeniya Osmanî dişopîne." (Wêjeya kurdî ya modern 2014)

Helbesta Koyî, ya ku bi navê "Xakî Cîzîrî Botan" di warê hişmendiya netewetiyê de helbesteke pir girîng e. Remezan Alan di derbarê vê helbestê de van tiştê balkêş dibêje ; *"Ev helbesta Koyî ger ji aliyê disîplîna dîroka edebiyata kurdî ve baş bê binecîkirin, dê destpêka edebiyata kurdî ya modern 17 sal beriya rojnameya Kurdistanê here"* (Alan, Li ser çend taybetiyên edebiyata kurdî ya modern 2014) û bi berdewamî girîngiya helbestê wiha didomîne :

*"1. Dîroka edebiyata kurdî ya modern beriya derketina rojnameya Kurdistanê ye û ji sed salî zêdetir e.*

*2. Koyî bi vê helbestê dikare bibe pêşengê helbesta kurdî ya nû, ji ber ku naveroka wê ji helbestên berê gelek cihê ye.*

*3. Edebiyata kurdî ya modern ne li bajarekî Kurdistanê, li payîtextekî kozmopolît (Stenbolê) derketiye meydanê.*

*4. Ev helbest wek keşkulê ye, tê de her tişt heye. Bi gotineke din, tê de wisan fikr bin guhê hev dikevin, yekparebûna mijara helbestê dikeve xeterê."* (Alan, Li ser çend taybetiyên edebiyata kurdî ya modern 2014)

Koyî perwerdehiyeke modern dixwaze ji bo wê, dibê bila rojname û pirtûk bînin derxistin û ol di bin tesîra xurafeyan derkeve. Koyî ji wî alî de ji bo civaka kurd jiyanekê demokratîk dixwaze. Aliye mafên jinan jî pêşveçûye, dibêje pêwîst e jin di dibistanên modern de bixwînin û perwerde bin.

Koyî li ser şopa Xanî ve diçe û terma 'milla, millet' dixwe termeke etnîk û sekuler û kurdan ji neteweyên din vediqetîne. Dîsa têgiha 'dewletê' jî wek bi karanîna zimanê rojava weke 'statu' dipejirîne. Wiha dibêje, zîmanê kurdî di aliyê nivîse de ne pir dewlemend e, divê rewşenbîr û nivîskarên kurd berhemên devkî berhev bikin û binivîsin. Fikra Koyî di vî warî de wekî fikra romantîkên Ewropayî

ye. Lêkolînerên rojava bi gelemperî cihê Koyî yê di nav projeya netewperweriyê çavê xwe digirin û rola wî ya li ser netewperweriya kurdan nabînin. Tenê Edmonds, qala Koyî dike derheqê wî wiha dibêje: “Koyî, mizgînavanekî teşeya netewperweriya kurdan a nûjane.” (Sönmez 2015)

Amîr Hassanpour jî li ser modernizma Koyî sekiniye. Li gor Hassanpour, Koyî modernîst e. Ji ber ku di helbestên xwe de behsa tiştên modern dike. Dîsa behsa teşeya edebî, rojname, kovar û romanên dike. Behsa teknolojiya heyamê dike û qala alavên teknîkî wek balafir, telgraf û gramafon û şeweyên nivîskî yên roman û rojname dike. (Hassanpour 2005)

Em dizanin ku modernîzm gava ku li Ewropayê dest pê kir, rewşenbîrên modenîst li dijî kîlîseyê derdiketin û xurafeyên olî û gelek gotinên keşeyan rexne dikirin. (Yuksel 2013) Em di helbestên Hacî de jî van rexneyên ku li dijî xurafeyên olî û xapandinên şêx û mella dibînin.

Di fikra Koyî de weke ku Alan jî dibêje, pêwîstiya nivîsîna bi zimanê kurdî, xelasiya civakê ji cehaletê, ji xweşbûna serxwebûna dewrên qedîm heya perîşaniya îroyîn, ji bêferasetiya malmezinan bigire heya fêmkoriya şêx û melayan, ji xîreta ji bo musteqîliyê bigire heya pêdiviya îradeya şexsî, ji bêqîmetbûna edebiyata kevin bigire heya geşbûna stêrka rojnameyan, ji xetereya avabûna Ermenistaneke mezin bigire, heya serobinbûna demografiya welatê kurdan, ji bo azadiyê hêza mişterek a şûr û qelem bigire heya avakirina artêşeke modern, di zept û reptkirina millet de ji rola fen û ilm bigire heya îtîfaqeke ku tê de her kes wekhev e” (Alan, Li ser çend taybetiyên edebiyata kurdî ya modern 2014) heye.

Alan bala me dikîşîne ser derengmayîne jî û li ser helbesta “Xakî Cîzîrî Botan” wiha dibêje; “*Elbet tê de telaşa derengmayîne jî heye: Hin millet li wê trêna musteqîliyê, medeniyetê û teraqiyê siwar bûn*” (Alan, Li ser çend taybetiyên edebiyata kurdî ya modern 2014)

Ji ber vê yekê Hacî Qadirê Koyî ji bo wêjeya kurdî hîmek e.

### **3.4. Hewldaneke Nû di Wêjeya Kurdî ya Modern de: Ekola Hawarê**

Piştî ku Komara Tirkîye ava bû, rewşa kurdan û bi taybet rewşa rewşenbîr, ronakbîr û siyasetmedarên kurd ket tengasiyê. Ji ber ku Komara ku nû ava bûyî li ser esasên nijadperestiya tirkî hatibû avakirin. Ev dihat wê wateyê ku ji bo kurdan rojên

zor û zahmet dest pê dikin. Ji ber hinek sedemên polîtîk û siyasi rewşenbîrên kurd derketên derveyî Tirkîyeyê. Hinek ji wan çûn welatên Ewrûpî û hinek jî derbasî Surîyeyê bûn. Kurdên ku derbasî Surîyeyê bûn karên xwe yê rewşenbîrî û siyasi li Şamê domandin. Yek ji wan kesan ew bû ku zana û ronakbîrekî yekta Celadet Elî Bedîrxan bû. Celadet ronakbîr û rewşenbîrên kurd li dora xwe civandin û dest bi parastin û pêşvebirina zimanê kurdî û wêjeya kurdî kir. Di rêbertî û pêşengtiya Celadet, di Kovara HAWARê bi tîpên latînî di sala 1932an de dest bi weşana xwe kir.

Di Hawarê de armanca weşandin û girîngiya wê wiha anîbûn ziman:

- \* Pêwistîya elfabeyek nû û belavkirina vê elfabeyê di nav millet de. Lêkolîna zaravayên kurdî û berhevdanîna wan.
- \* Cihê zimanê kurdî di nav zimanên Arî de. Bingehên zimanê kurdî, dîrok û awayê rabûn û pêşketina wî.
- \* Berhevkirina çîrok, lawij û stranên kurdî û belavkirina wan.
- \* Dabeşkirin û belavkirina dîwanên kurdî û jînenigarîya şair, nivîskar û merivên din yê bijarte.
- \* Lêkolîna li ser folklor û stranên kurdî.
- \* Lêkolîn li ser dîrok û erdnîgarî.
- \* Lêkolîn li ser hunerên kurdî

Hawar dengê gel bû. Bi gotina Ergün di Hawarê de welatê kurdan meydana şer bû, di bin destê dijmin de dinaliya û li çiya û bajarên wê berxwedan li dar e. Weke ku Ergün ji Hawarê girtî: *“Herwekî ku di helbesta “Tola Welêt” de tê nîşandan, welat gelek nexweş e, ji ken û geşiya berê tiştek nemaye, welat îro dilreş û bêmad e. Loma jî bi kurên xwe re naaxive. Kul û kovanan ji her alî ve welat dorpêç kiriye û ji ber vê jî dinale”* (Ergün 2015) Ji xwe hawar bi hemû nivîsên xwe derdê welêt tanî ziman.

Di kovarê de rewşenbîrên kurd weke Celadet Bedîrxan. Kamiran Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nureddîn Zaza, Qedrî Cemîl Paşa, Cegerxwîn û gelek kesên din nêrînên xwe tanîn zîman. Bi saya Hawarê ekolek bi navê “Ekola Haware” derket holê.

Nîvîskarên Hawarê her yek ji bo wêjeya kurdî lehengên bêhempa ne. Hemû nivîskarên Hawarê karekî netewperwerî kirine. Hinek ji wana tesîra wan heya roja îro jî li ser gel heye.

Di warê wêjeyê de jî berhemên gelek bi qîmet derketin holê. Di kovara Hawarê de ji bilî Celadet Bedîrxan birayê wî Kamiran Bedirxan, Nûredîn Êsîf, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Telet Qedûr Hecî Elî Begzade û Hevîndê Sorî jî nêrînên xwe dianîn zimên. Di warê kurte-çîrokên de jî Hawarê gavek pir hêja avet. Nureddîn Zaza di vî warê de wekî “Çehovê kurdan” dihat bi nav kirin. Celadet Bedîrxan li gel xebatên xwe yê ilmî û zimanzaniyê de car bi car nivîsên pexşanî jî diweşandin. Helbesta bî navê “Bilûra Min” pir hêja ye.

Lê di warê helbestê de Cegerxwîn cîhekî wî yî taybet heye. Wekî ku me behs kir bandora helbestên wî hin jî heta roja îro dom dikan.

Cegerxwîn, ji ber bîrbûn, zanîn û dûrdîtina giringiya zimanê kurdî di hebûna milletê kurd de, bi berdeyamî, bi kurdî nivîsand û bi wêrebûn, bê tirs helbestên xwe li dor kul, êş û derdên gelê kurd hûnandin û wiha di çerxê 20an de xebat û bizaveke pir mezin ji ziman û rewşenbîriya kurdî re pêşkêş kir.

Di warê helbesta kurdî ya modern de pêwîst e mirov bizane ku Cegerxwîn li pêş e. Ew yek ji nivîskarên Hawarê yê herî pêş bû. Cegerxwîn di helbesta kurdî de heyamekî nû ye. Di helbestên xwe de dijîtiya çîna yêtiyê dikan. (Uzun 1992, 85)

Cegerxwîn ne tenê di warê helbestê de berhem hilberandine. Di heman demê de textên pexşanî jî weşandine. Çîrokên gelekî hêja nivîsandîne. Hemû berhemên Cegerxwîn bi rastî pir bi qîmet in. Lê ji bo mijara me Çîroka “Cîm û Gulperî” metneke guncan e.

Cegerxwîn Çîroka Cîm û Gulperî kiriye keşkûlek û her tişt tê de bi cî kiriye: Bêtiya kurdan, belengazî, koçberî, talankirina eserên dîrokî, adetên paşverû, evîndariya dotmam û pismaman, parodiyên ku digihîjin çîrokên gelêrî (wek Siyabend û Xecê), li hember zordariyê, şer û xîret hwd.

Cegerxwîn van yekan bi riya evîna Cîm û Gulperiyê qise dikan, ji zaroktiyê heya azibiyê. Bi ger û geştên van her du cîranên dildar dixwaze ji civata kurdan panaromayek li ber me dayne. Alan, di analîzeke li ser vê çîrokê wiha dibêje: “Bi gera wan a Lubnanê destnîşan dikan ka kurd çiqas belavî her derê dinyayê bûne; bi gera çiya hem xweşikbûna sirûştê welatê kurdan û hem kavilbûna avahiyên wê yê

dîrokî û hem jî şahidbûna bêtalihiya evîndarên vê serdemê ku di rewş û tentêla Siyabend û Xecê de ne; bi çûna sînemayê li hember zilmê desthilanîneke şoreşger; bi gera Amedê, pêşbaziya hespan û mêrxasiya ciwanên kurd hwd. nîşan dide.” (Alan 2014) Em li vir fêm dikin ku ev çîrok ji bo gelek sedeman hatiye nivîsîn.

Alan, bî berdewamî: “Cegerxwîn ji bo peyamên civakî wisan dilxwaz e, di dawiya metnê de ji bîr dike ku ji ber sedemên adetî malbata Gulperiyê naxwaze bi Cîm re wek berê bigere, ji ber ku her du jî mezin bûne, serbestiya masûmiyeta zaroktiyê li dû maye û malbata qîzîkê ji gotegotên gundiyan ditirse. Lê Seyda çîrokê ji vê çarçovê derdixe, dike nav çarçoveyêke din. Tu lê dinêrî qodên çîrokê tev ber bi wateyên temsîlî ve şemitîne. Ji ber ku Gulperî, di dawiya çîrokê de êdî ne qîza cîran e, welatê dîlketî ye û yên ku dîtina Cîm lê qedexe kirine û jiyanê lê kirine dojah jî ne malbata wê ye, “dijmin” in. Ji xwe di dawiya çîrokê de ji devê Gulperî bixwe ev peyv derdikeve, dibêje “bêkuştin û yekîtî tu min ji nav lepên dijminan dernaxî”. (Alan 2014)

Cegerxwîn di warê zanabûn û pêşketina millet de rola rewşenbîr û ronakbîr pir girîng dibîne û wiha dibêje:

Mijûl be bi zanîn û hem torevan  
Bibe payedarek di nêv cihan

Bilîze bi zanîn di nav dewleta  
Bibe jîr û hozan di nav mileta

Bi paye serê me bilindbî bi te  
Bi zanîn çî bêjî guhê me li te

Ji bo me li her der bibe bervedêr  
Di rojên şeran de bibe xurtemêr

Siyaset û tarîx û tora û rist  
Bixwîne bi hev re ciwan û dirist

Bibe jîr û zana di her çax û dem  
Ji ser me tu rake çî zor û setem(**Helbesta Rêzanî, Dîwana şefeq**)

Cegerxwîn, berdevkê milletê xwe ye. Helbestvanê netewî ye. Li gorî dewra xwe difikire. Fikrên wî modern in.

Em bi zelalî dibinin ku nivîsên Cegerxwîn bi rengekî modernîst hatine nivîsandin. Gelek helbestên Cegerxwîn bûne stran û li ser lêvên keç û xortên kurdan in. Heta roja îro jî bandora helbestên wî li ser civaka kurd berdewam e û wê her berdewam jî be.

Dîsa ev li ber çavan e ku helbestên ku di nav kurdan de (taybet bi riya stranan) herî zêde belav bûyîn, helbestên Cegerxwîn in. Wî xwestiye ku bi riya rewşenbîriya xwe gel hişyar be û xwedî li mafê xwe derkeve.

### **3.5. Wêjeya Modern ya Kurdî di Nav Kurdên Yekitiya Sovyetê de û Riya Teze**

Weke ku me li jor behs kir, kurdên ku li Yekitiya Sovyetê dijiyan bi şoreşa Cotmeha 1917an gîhîştin mafên xwe yên çandî.

Her çiqas ku wêjeya kurdî ya Sovyetê ne wêjeya sîrgûnêye jî ji ber ku ji welêt dûr bûn şert û mercên wan hinekî dijwar bû. Wêjeya kurdî ya Sovyetê pir balkêş e, wesif û hişmendiya xwe ya kurdî parastîye û bi zimanê welat ve girêdayî ye.

Berîya kovara Hawarê, li Rewanê kurdên ku li Yekîtiya Sovyetê dijiyan rojnameya Riya Teze di 25 Adarê sala 1930'î de derxistin. Rojnameyê nivîsên xwe bi tîpên latinî çap dikir. Elfabeya rojnameya Riya Teze, ji 37 tîpan pêk dihat.

Di sala 1929an de zimanzanê Ermenî Îshaq Margulov û nivîskarê kurd Erebê Şemo, li ser bingeha elfabeya latînî, elfabeyek ji bo kurdan çê kirin. Ev elfabe di warê perwerdeyê, çapê û hemû cureyên nivîsandinê da hat bikaranîn. Rojnameya Riya Teze heta sala 1945'an bi vê elfabeyê çap bû. Di 1945'an şûn de elfabeya Rûsî (Kirîlî) dewsa vê elfabeyê da hat bikaranîn. (Çetin 2016)

Rojnameya Riya Teze ku li Eriwana Ermenistanê weşanê dike, ji sala 1955ê heta destpêka sala 2001ê bi tîpên kirîlî dihat weşandin, lê ev 10-11 sal in ku weşan careke din veguheştiye ser tîpên latînî. Ji xwe ji avakirinê heta 1937ê rojname bi tîpên latînî dihate weşandin. Riya Teze rojnameyeke wisa ye ku em dikarin bibêjin, 'temendirêjtirîn rojnameya kurdan a li seranserê cîhanê ye.

Temûrê Xelîl girîngiya Riya Teze wiha bi lêv dike: *“Rya teze” ber dilê min diha ezîz e:*

1) *Ji ber ku ew rojnameya kurdî ya herî jîyandirêj e li cihanê.*

2) *Dengê kurdên Sovyetistanê bû (hetanî sala 1992) û niha jî dengê kurdên Ermenîstanê ye, yê ji welatê kal-bavan dût.*

3) *Ew bi tevayî 50 salan zêdetir ji aliyê dewletê, bi fermî ronahî didît (niha jî — serbixwe ye), ango resmî bû û organa Komîtêya Navbendî ya Partîya Komûnîstîyê ya Ermenîstanê, parlamênt û hukumeta komarê bû. Yek ji çar rojnameyên sereke bû li komarê.” (Xelîl 2009)*

Piştî ku Hawar dest bi weşanê dike haya kurdên Rewanê jêçedibe û li Rewanê Hacîyê Cindî çend hejmarên Riya Teze Ji bo pîştgirî ji rêvebirên Hawarê re dişîne û ji bo vê sedemê dewleta Sovyetê wî derdest dike û salekê cezayê hepsê didin wî. (Xelîl 2009)

Dema ku hejmarên Riya Teze digîhîşin destê Hawarê Celadet Alî Bedirxan bi nasnav Herekol Azîzan di hejmara Hawarê ya 8an de wiha behsa Riya Teze dike: *“Rêya Teze Rûjnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurmanciyê xwerû, li Rewanê, di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gehîştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dilê me şa û geş bû.*

*Kurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê çar roj mijûlahiya xwe bi wan kirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bihna kulîlkên çiyayê Elegozê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav Resmên wan de şal-û-şapikê kurdmancî, xencer û piştixencera kal û kalikên me dihatin dîtin. “Rêya Teze” wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê kevintir e, bi emrê jê mezintir e. Hejmara wê a paşîn ko gehîştîye destê me a pencî û nehan e. Li gora ko Rêya-Teze rûjnameke deh-rûjkî ye, berî salekê û hin dest bi derketinê kiriye.” (Hawar, hejmar 8 r.164)*

Xwendevan û nivîskarên ku li dora rojnameya “Riya Teze” xwe komkiribûn, bi serê xwe hêzeke siyasî û çandî bûn. Roj bi roj xwe xwurt dikirin û berheman diafirandin. Şansê wan yê mezin ew bû ku di dîrokê de gelek kurdên siyasî dem bi dem derbasî Yerîvanê bûbûn. Ev kesayetiyên siyasî bûbûn çavkaniyên romana kurdên Yerîvanê. Heta nivîskar bi xwe gelek caran ew kesayetî bûn ku dibûn mijara romana xwe. Nivîskarên ku xwe dabûn der û dora “Riya Teze” dixwendin,

dinivîsandin û berhemên xwe belav dikirin. Di nava berhemên wan de ji nivîsên rojane heya roman û helbestan her cûre nivîs peyda dibûn.

Bi saya Riya Teze destxetên Erebe Şemo, Ebdula Goran, Hacîyê Cindî, Îsmet Şerîf Wanlî, Qanatê Kurdo, Hejar, Çerkezê Xudo, Margarîta Rûdênkoyê, Emînê Evdal, Ahmedê Mîrazî, Wezîrê Nadîrî, Reşîd Kurd, Nadoyê Xudo û gelekên mayîn, bi sedan name û wêneyên welatparêzên ji Kurdistanê û ji cîyên mayîn îro ji bo kurdan xezîneke giranbiha maye.

Çawa ku “Ekola Haware” heye Riya Teze jî ji bo kurdan bû ye “Ekoleke nû û jêre gotine “Ekola Riya Teze”.

Dîsa em dibinin ku Riya Teze di nivê sedasala 20an de dibe denge kurdên Qefqasya û rola xwe ya netewî baş dilîhîze. Gotinên Temûrê Xelîl jî vê yekê rast dikin. Xelîl bi gotina xwe ya; *"Riya Teze" dengê kurdên Ermenîstanê, serbilindîya me bû. Qîmetê rojnameya me yê herî bilind ew bû, ku carna jimara aboneyên me di salê da digihîşte 5 hezar kesan. Ew jî wî çaxî, ku li Yêrêvanê 8 hezar kurd diman, lê li Ermenîstanê bi tevayî — weke 60 hezaran. Û nav û dengê rojnameya me ewqasî bilind bû, ku navê wê di kataloga Sovyetistanê û ya navneteweyî da jî hebû. Ji ber wê jî aboneyên me ji komarên Sovyetistana berê û Awropayê jî hebûn. Û rojname bû bingeh, ku helbestvan, nivîskar, ulimdarên kurd peyda bin, gel bi kurdîtî mezin be û pêş va here"* rola Riya Teze û bandora wê ya li ser vedibêje.

Ji xwe armanca rojname, kovar, nivîs ne hişyarkirina gel bû? Armanca ne ew bû ku kurd li mafên xwe xwedî derbikefin û haya kurdan ji dîroka xwe hebe û kurd li çanda xwe, nasnameya xwe û wêjeyê xwe ya netewî derbikefin? Em dibinin ku Riya Teze e rolê xwe yê wêjeyê netewî bi başî tîne cîh.

Wêjeyê kurdî ya Sovyetê hem dî warê pexşanê, helbestê hem jî di warê romanê de pêşketî bû. Rewşenbîrên ku di Riya Teze de dinivîsandin di heman deme de bingeha xetaba yekemin ya wêjeyê kurdî ya modern li Yekitiya Sovyetê ava kiribûn.

Berpirsiyarê nû yê Riya Teze Tîtalê Keremê Seyad weke peyama ji hemû kurdan re dibêje : *"Rojnameya me civakî û çandî ye. Di pêvajoya nû de gelek tişt hene ku em dixwazin bikin, lê her tişt bi derfetan ve girêdahî ye. Rojnameger divê di nav gel de bigere û derbarê wî de binivîse, qewimandinên girêdahîyê çand û hunera gel tê de biweşîne. Em deyndar in vî karî bimeşînin. Heyfa me li vê rojnameya kurdî*

*ya jîyandirêj tê. Ev rojnameya gelê me ye ku di riyê gelekî çetin û dirêj re derbas bûye."*

Riya Teze car bi caran ji ber hinek astengiyên darayî, polîtîk-siyasî hate girtin û dîsa rabû ser xwe u weşana xwe heta roja îro dom kir. Riya Teze herwiha li ser înternetê jî weşana xweya rojane dike. (<http://krd.riataza.com>) Ew Rojname weke ku Temûrê Xelîl ji bi lêv kir Rojnameya kurdî ya herî jiyandirêj e. Lê mixabin kurdên ku li Tirkiye- Iraq-Iran û Sûriye dijîn li vê rojnameya herî jiyandîrej derneketin. Gelo ev jî ne rengê modernîzma derengmayînê ye?

### **3.6. Rewşa Wêjeya Modern ya Kurdî li Dîasporayê**

Dema ku em behsa Dîaspora dikin wate ew e ku kurdên ku li ser axa xwe ji ber hinek sedeman dev ji axa xwe berdan û çûn li welatekî din bi cîh bûyîn e. Di vi warî de li her parçeyan hinek kurdan dev ji axa xwe berdayê û çû ye dîasporayê. Li wîr kar û xebatên wxe yên wêjeyî, çandî û siyasi domandine. Em karin bejin dîaspora bi kurdên ku li Tirkiyê dijîyan destpêkir. Cara yekem rewşenbîr, ronakbîr û siyasetmedarên kurd yên ku li Stenbolê kare xwe yên rewşenbîrî dikirin dev ji axa xwe berdan. Tê zanîn ku Mîqdat Bedîrxan cara ewil çû Misrê û dest bi weşana rojnameya "Kurdistan"ê kir. Her çiqas ku Misir axa Împaratoriya Osmaniyan jî bû ne axa kurdan bû. Malbata Bedîraxniyan di pêşî de bere xwe dan Ewrûpayê lê li wir zêde nesikinîn û vegeriyan Şamê. Destpêkirina di warê xebatên ku li ser wêjeya kurdî ya Dîaspora hat kirin piştî nivê sedsala 20an e. Gelek kurd li Swêd, frensa, elmanya û hwd. bi cîh bûn. Lê di warê xebatên rewşenbîrî de Swêd û frensa li ber çava ye. Li frensayê Enstitûya Kurdî hat vekirin û lêkolînên akademik li vir hat kirin. Kurdên ku li Swêde bi cîh bûne gelek xwebatên hêja kirin. Ji ber vê yekê Dibistanên Kurdî jî ji bo zarokên kurdên ku li swedê dijîn vebûn. Gelek nivîskaran berhem hilberandin. Gelek sazî û dezgehên ku li ser wêje, dirok zîman û çanda kurdî xebatan dike hene. Li Elmanya jî li Berlînê Enstitûya Kurdî vebû kar û xebatên rewşenbîrî li vê derê jî destpêkir.

Li vir pewîste em hinek behsa kurdên ku bi destê Stalîn hat mişextî kirin bo Asya Navîn jî bikin. Piştî salên 1935an stalîn dest bi sîrgûnkirina hinek kurdan kir ku di nav axa Sovyeta kevn de li ser sînorê Tirkiyê dijîyan kir. Sîrguna dawî sala 1944an bû. Gelek kurd ji bo Kazakîstan, Kirgizîstan Özbekîstan û Turkmenîstanê

hatin mişextî kirin. Kurdên ku li vir, piştî ewqes zor û zahmetiyê destê hevdu girtin sazî û komalên xwe ava kirin û orf û adet û kevneşopiya xwe parastin. Weke mînak îro li Kazakistanê nezîkî 150 hezar kurd dijî û bi rexistinî xebatên xwe yên wêjeyî, çandî û zîmanzaniyê dikin. Li Kazakistanê bo zarokên kurdan di heftê de li dibistanên fermî yê dewleta Kazakistanê 4 saat dersa zimanê kurdî tê dayîn. Materyalên ji bo derse jî bi deste rewşenbîr û zanayê kurdên wî welatî hatine amade kirin.

Li dîaspora weke ku me behs kir gelek rewşenbîrên kurd berhem çêkirin û xwestin ku peyvira xweya netewî bînin cîh. Di nav kurdên dîaspora de gelek nivîskar û rewşenbîr hene ku di nav civaka kurdî de cîhê wan cuda ye. Bi xebatên xwe yên hêja de li ser Romana modern ya kurdî Mehmet Uzun di nav kurdên Tirkîyê de bi nav û deng e. Emê hinekî li ser xebatên Mehmet Uzun bisekinin û xizmeta wî ya di warê wêjeya kurdî ya modern bi taybet afirandina romana kurdî bi bîr bînin.

Mehmed Uzun li sala 1953ê li gundê Siwêreka ser bi Rihayê (Urfayê) hat dinyayê. Ji ber xebata wî ya nivîsîna bi zimanê dayikê çend caran ji aliyê desthilata Tirkan ve hat zîndankirin. Ji ber wan gefên li ser jiyana xwe, ji Tirkîyeyê derket û heyameke dirêj li Swêdê ma.

Uzun, di jiyana xwe de heft roman û gelek ceribandin, lêkolîn û helbest nivîsîne û weşandine. Helbesteka wî ya dirêj bi navê Destana Egîdekî ji layê hunermend Ciwan Hacoî ve hatiye strandin. Mehmet Uzun tenê bi kurdî nenivîsiye, gelek berhemên bi zimanên tirkî û swêdî jî nivîsîne.

Îro hinek kes wî wekî serkêşê romana kurdî ya modern dipejirînin, her çiqas ev cihê nîqaşê be jî, lê rastî ew e ko ew ji wan kesan e ko berhemên wî herî zêde dihên xwendin û hezkirin. Bi taybetî hêjayiya romana Siya evîne û Ronî mîna evîne tarî mîna mirîne gelek berçavtir e. Ji xwe ev herdu berhem bo zimanên bîyanî jî hatine wergerandin (<https://ku.wikipedia.org> 2017)

Mehmet Uzun bi giranî li ser wêjeya kurdî ya modern sekinî ye. Ew di berhemên xwe de her tim behsa rewşa Kurdan û parçekirina axa wan dike. Bala xwendevanan dikîşîne ser zahmetî û astengên li ber ziman û wêjeya kurdî. Û bi awakî xurt li ser pêşi û klasîken wêjeya kurdî u wêjeya devkî jî radiweste.

Mehmet Uzun di romanên xwe de û di berhemên xweyê din de pirtir şîretan li ronakbîrên kurd dike. Ew dibêje *"Ronakbîrên welatekî, rûmeta wî welatî ne"* (Uzun 1992, 3)

Nivîskar rola ronakbîran ji bo peşketina civateke paşdemayî pir baş dizani: "Hewl û karê ronakbîrî hertim li peşiya dîrokê ye. Gelek caran dîrok li gora firehbûn, kurbûn û quweta van hewl û karên ronakbîrî şikil digre", Di hevpeyvîneke din de dîsan tê ser ronakbîran: *"Peşketina ronakbîran â tevgera ronakbîrî, peşketina welate."*

Mehmet Uzun hemû romanên xwe bi kurdî nivîsîne. Ew sedema bi kurdî nivîsandina roman û berhemên xwe wiha tîne ziman: *"Gava rewşa zimanê min ê bav û kalan ewçend kambax be, eze çawan jê rû badim û bi zimanekî din binîvîsim? Ezê çawan beşdarî li avakirina edebiyata modern a kurdî nekim. Çawan ezê xwe ji avakirina tevgera ronakbîrî, felsefî, çandî û edebî ya millî bidim alî?, Li gora kîjan prensîbên exleqî ezê van yekan bikim?"* (Uzun 1992, 4)

Bi van gotinên hêja yên Uzun de em şopdariya zanayê mezin Ehmedê Xanî dibinin. Çawa ku Ehmedê Xanî digot:

Da xelq-i ne bêjîtin ku: Ekrad  
Bê ma'rîfetin, bê esl û binyad

Enwaê mîlel xwedan kitêbin  
Kurmanc-i tenê di bê hesêbin (Xanî 1968, 60)

Mehmet Uzun jî dibêje *"Gava rewşa zimanê min ê bav û kalan ewçend kambax be, ezê çawan jê rû badim û bi zimanekî din binîvîsim?"* Gelo çi ferq heye di navbera gotina Xanî û Uzun de? Heke ku Koyî Şopdarê xanî yê sedsala 19an e, Uzun jî şopdarê Xanî yê modern ê sedsala 21ê ye.

Îbrahîm Seydo Aydoğan li ser girîngiya Mehmet Uzun ; *" Bêguman, Mehmed Uzun bi nivîskariya xwe ve rengêkî nû û şêwazeke xweser anî edebiyata kurdî û romana kurdî populer kir. Em dikarin weha bibêjin ku wî bi berhemên xwe ve ji nû ve ruh da roman û wêjeya kurdî"* dibêje (Aydoğan Romanên Mehmed Uzun)

Mehmet Uzun piştî ku di nav kurdên Tirkiyeyê de hat naskirin, nav û dengê wî belav bû. Xwendekarên wî zêde bûn. Mehmed Uzun dixwest ku romaneke li gorî standardên Ewrûpî binivîsanda. Wî dixwest ku weke rewşenbîrên Ewrûpî yê ku bi nivîsên xwe xizmeta neteweyên xwe kirin, bandora modernîzmê li ser kurdan bike. Lê mixabin şert û merc ji bo vê yekê asteng bûn. Her çiqas ku Mehmet Uzun ji bo neteweya xwe qelema xwe bi kar dianî, nemaze dixwest ku kurdên li Tirkiyeyê dijîyan hişyar bike û wan vegerîne ser hişmendiyê netewî.

### **3.7. Bi Nêrîneke Giştî Rewşa Îro ya Wêjeya Kurdî ya Modern û Modernîzma Kurdî ya Derengmayî**

Bi awayekî giştî me li ser wêjeya modern ya kurdî de di destpêka wê de heta dîasporayê niqaş kir. Rewşa îro ya wêjeya kurdî helbet ne wek roja destpêka wê ye. Dem hatiye guhertin û di saya pêşketina ilm, fenn, teknoloji û firehbûna hişmendiyê, kurd ji berê pirtir nezîkî hevdu bûne.

Li her çar parçeyên ku kurd lê dijîn kurd di warê hestên neteweyî de ji beriya 70-80 salî, zêdetir hişyar in. Di vê xebata bi sînor de derfet tune ye ku em behsa rewşa wêjeya kurdî ya her çar parçeyên ku kurd lê dijîn bikin. Lê emê hinekî li ser rewşa îro ya wêjeya kurdî ya modern li Tirkiyê bisekinin. Ji ber ku Stenbol di qonaxa wêjeya kurdî de cîhekî taybet bû, her çiqas ku kurdên li Stenbolê xebatên xwe dikirin, terka Stenbolê kirin û belav bûn jî şopdarên wê qonaxê her hebûn. Lê ji ber qedexe, zor û zahmetiyan ew şopdarên qonaxa Stenbolê demeke dirêj bêdeng man.

Piştî salên 60î em dibînin ku hêdî hêdî liv û tevgera xebatên rewşenbîr û siyasîmedarên kurd li Tirkiyeyê dest pê dike. Li vir xebatên Musa Anter yê ku di salên 60î de kirin hêjane ku wek mînak bîna dayîn. Piştî salên 60î di warê tevgerên siyasî de gelek rêxistinên kurdan jî hatin saz kirin. Weke me behs kir wêje û politîka piştevaniya hevdu dikin. Her çiqas ku nivîsên wan salan zêde politîk-îdeolojîk jî bûn di warê wêjeyê de pir girîng in. Lê wêje ku ji peywira xwe ya sereke dûrket û ket bin bandora bîrdoziyê-îdeolojiyê, tesîra wê kêmtir dibe.

Di navbera salên 1980 û 1992an de li ser zîmanê kurdî qedexe hebû û em dikarin bêjin piştî belavbûna Qonaxa Stenbolê bêdengiya duyemîn di navbera van salan de dest pê kiribû. Piştî ku rewş aram bû û qedexe li ser zîmanê kurdî hinekî sist bû di warê wêjeya kurdî de hewldaneke nû dest pê kir. Piştî vê hewldanê gelek

kovar, rojname, pirtûk derketin. Çend weşanxaneyên ku xebatên rewşenbîr û nivîskarên kurdan diweşandin vebûn. Hê jî gelek ji wana karê xwe berdewam dikin. Em dikarin bêjin ku di nav kovarên ku piştî salên 1990î li Tirkiyeyê derketin de ya herî jiyandirêj û bênavber di warê wêje, çand, huner û zîmanê kurdî de weşanê dike bêguman Kovara Nûbiharê ye. Piştî ewqas kar û xebatên wêjeyî nezîkbûneke germ li ser wêje û lêkolîna zîman û dîroka kurdî çêbû. Di salên dawî de li Tirkiyeyê di dibistanan de dersên hîlbijarî yê zîmanê kurdî ket nava mufredata Wezaretê Perwerdeyê ya Tirkiyeyê. Li çend zanîngehan di bin banê beşa Zîmanên Zîndî li Tirkiyeyê de beşa zîmanê kurdî vebû. Enstitûyên ku girêdayî beşa zîmanên zîndî vebûn û di warê akademîk de kar û xebat li ser zîmanê kurdî hate kirin. Xwendina mastera bi tez û ya bêtez li ser zîmanê kurdî dest pê kir.

Tevî ewqas liv û tevger dîsa jî em nikarin bêjin ku modernîzma kurdî hem di warê wêjeyê hem jî di warê guherîna jiyana civakî de weke modernîzma neteweyên dîtîr bi ser ketiye. Dibe ku wêjeya kurdî di warê metod û teşeyê de modern be, lê di nav civakê de wêjeya kurdî hê ne bi bandore. Ev jî bi rewşa polîtîk-siyasî ya wî welatî ve girêdayî ye. Çawa ku me li jor behs kir wêje di warê hişyarkirina hestên netewî, vejandina çandêke netewî, zîmanekî netewî, hişmendiyêke netewî de girîng e. Dîsa me çend mînak ji çend neteweyan nîrxandin ku heya serbixwe nebûne û rêvebirîya xwe bi dest nexistine modernîzma wan ne kemilî ye. Weke gotina G.Plehanov: “*Edebiyat hacetêke ku ji rizgariya netewî re dibe alîkar*”, (Polat 2001) rola wê li ser hişmendiyê netewperweriyê zexm e.

Weke ku li jor jî hat behs kirin modernîzma yewnanî , ya Mîsrê, ya tirkî, û hwd. jî derengmayî ye. Lê modernîzma derengmayî ji bo wan welatên ku hat behs kirin êdî ne modernîzmeke derengmayî ye ew êdî bi xwe modernîzma pêşnimûne ya wan netewan e. Belkî di destpêkê de derengmayî bû. Ji ber ku bi giranî teqlîda modernîzma Ewropî bû.

Teqlîd ne wek esil e. Piştî ku tiştê ku modernîzma Ewropî ji neteweyên Ewropî re pêk anî ji wan neteweyan re jî pêk hat, êdî hewcedarî bi teqlîda modernîzma (tarz û metoda wêjeya Ewropî) Ewropî nema.

Lê ji neteweya kurd re em nikarin heman tiştî bêjin. Ji ber ku hê kurd weke neteweyên Ewropî sûd ji modernîzmê wernegirtibûn (Hê jî wernegirtine). Belkî wêjeya kurdî di warê metod teşeyê û mijarê de xwe veguhast li ser rengekî modern lê

civakê bi temamî ji wê wêjeya modern ya kurdî feyde nedît. Nivîskarê Kanadayî Margaret Atwood li ser vê mijarê berhemek bi navê “ Lêkolînek di derheqê di wêjeya Kanadayî de tiştê Kanadayî çî ye” nivîsandibû û rexne dikir ku wêjeya Kanadayê hatiye îhmal kirin. Û tê de digot li ser wêjeya Kanadayê tesîra kevneşopiyên Îngîlîz û Emrîkayê zêde ye û ji ber vê xwesteka wêjeyêke Kanadayî dikir. (Jusdanis 1998, 77) Helbet wêjeyêke Kanadayê hebû lê ji ber ku giraniya kevneşopiyên neteweyên dîtir di nav wê wêjeyê de hebûn, ew wek wêjeya Kanadayê nedihat qebûl kirin. Bi vê mînakê em dikarin rewşa wêjeya kurdî jî bînin ber çavan. Bi berfirehî em li ser bandora ku modernîzm û wêjeya modern li ser neteweyan kir sekinîn. Me dît ku hinek netewe berî ku modernîze bibin azadiya xwe bidestxistin û dûv re wêjeyêke netewî ango modern afirandin û hinek neteweyan jî di serî de xwestin wêjeya xwe ya modern biafirînin û peyra xweser bibin.

Wate û armanca sereke ya wêjeya modern û wateya destpêkirineke serdemeke modern, azadbûna neteweyan û yekitiya wan bû. Yanî wate ne ew bû ku “wêje ji bo wêjeyê” bû. Demeke dirêj di wêjeya tirkî de me ev nîqaşa ku li ser “huner ji bo hunerê” ye dît. Wêje di dawîya dawî de armanca wê, piştgiriyêke xurt ji bo netewetiyê, yekitiya netewî, azadiya netewî û serxwebûna netewî bû.

Di vê astê de pewîstî heye ku em bi rehetî bêjin ew neteweyên ku îttîfaqa netewî pêk anîn, hestên netewetiyê xurt kirin, û serbixwe bûn dê bibin xwedî wêjeyêke modern û ew netewe dê ji modernîzmê sûdê werbigrin.

Wî çaxî derdikeve holê ku modernîzma kurdî hîn jî modernîzmeke derengmayî ye. Di vî warî de Alan modernîzma kurdî ne tenê derengmayî dibîne di heman demê de modernîzma kurdî “elîtîst, pozîtîvîst, muessîr, ji tekamula takekesî, sekûleriyêke ku metafîzîk danîbe aliyekî dûr” (Alan 2015, 51) dide diyarkirin. Her çiqas ku Jusdanîs modernîzma yewnanî jî derengmayî dibîne em nikarin modernîzma yewnanî û kurdî berawird bikin. Belkî em dikarin modernîzma belûciyan û kurdan berawird bikin lê ya yewnanî û kurdan ne mînakeke ku li hev tê ye. Dibe ku di destpêkê de modernîzma yewnanan jî derengmayî be lê di domana demê de yewnanî ew ast derbaskirin. Ji ber ku yewnanî serdest in. Lê kurd ne serdest in. Bandora wêje û çanda neteweyên serdest li ser kurdan heye.

Weke ku Alan dibêje “*Ji xwe ne xerîb e ku di gelên bindest de erka edebiyatê, heya radeyêke di bin xizmeta mebestên kolektîf de be. Piştî vê seetê tiştê*

*xerîb ew e ku hêza edebiyatê evçend bê zeîfkirin û wek enstrûmaneke xeyrî-xweser bê dîtîn. Çimkî dibe ku ev yek bi xwe re qelsbûn û belawelayek bîne. Nexwe polîtîkbûna edebiyata kurdî, waqîyek e. Kurd çî ye ku miletekî bindest e, nûsîna bi kurdî, bi serê xwe helwesteke de-kolonyal e. Ger neyê jibîrkirin ku sîstemên kolonyal çand û zimanên herêmi bêqîmet dîkin û wan li ber çavên xwediyê wan reş dîkin, wê demê kurdî-nûsîn, li hember vê bêqîmetkirinê, li hember asîmîlasyona çavsor bersiveke polîtîk e.” (Alan 2014)*

Çawa ku modernîzma Ewropî ji netewên dîtîr re pêşnimûne ye em dikarin bêjin gorî modernîzma kurdî, ya tirkan pêşnimûne ya ji netewa tirk re. Ji ber vê yekê hê modernîzma kurdî derengmayî ye.

Li jor me behsa tezahûrên modernîzma prototîp kir. Di aliyê din de modernîzm ne tenê di warê hişmendîya neteweyî de kar dike. Di heman demê de ji bo pêşxistina ilm û fennê jî gel teşwîq dike û dibêje bê ilm û fenn modernîzm tamam nabe.

Me di xebata xwe de hewldanên rewşenbîren kurd dîtîn. Wan dixwest ku kurd modern bin û xwedî mafên xwe bin. Ev xwestek ne ji sedsala 19an an jî 20an destpê dike. Hê ji sedsala 17-18an de bi berhemên Ehmedê Xanî (1651-1707) destpê dike. Ew hewldan û xwestek berî şoreşa frensî (1789) û berî meşrûtiyeta yekem (1876) ya tirkan bû.

Di xebata xwe de me dît ku rewşenbîrên kurd fêhm kirine ku bê ilm û fennê modernîzm çênabe û netew bi pêş nakevin. Koyî li ser vê yekê sekiniye û gotiye:

Ehlî japon be fenn û sin’etî çak

Seyrî çon Çînî girt û kirdiye xak (Koyî 2004, 106)

Ev gotinên Koyî pêşdîtineke pir pêşwext e. Dîsa Mehmet Uzun di berhemên xwe de li ser vê mijarê disekine û di vî warî de rola rewşenbîr û ronakbîran bi bîr tîne û dibêje; *“Peşketina ronakbîran a tevgera ronakbîrî, peşketina welat e.”* Pêşketina welêt bi çî ye? Helbet bi ilm û fennê ye.

Raste, gorî modernîzma Ewropî, li ber çavên neteweyên dîtîr xwevekişandinek jî heye. Ew jî navberîmayîna di nav “kevn û nû”yê de ye. Di vir de rola olê pir girîng e. Ol ji bo pêşxistina gel bûye astengekê û gel ji modernîzmê tirsîya ye. (Ol bi naveroka xwe ya rasteqînî ne dijî modernbûnê ye, ji ber şîrovevên

hinek oldaran, mijar wisa hatiye fêmkirin. Ev mijareke sereke ye ku bi serê xwe lêkolînên kûr li ser bên kirin e.)

Liv ir em dibînin ku Koyî ev astengiya şêx û meleyan dîtîya û rexne li wan kiri ye. Ê wiha pêde çû ye:

Şiklî tekeye û xanegahî şêxakan  
Waqî'en rengîne e emma bo rîyan

Lem hemû şêx û murîdenay rîya  
Ferdekî naçête mizgewtî Xuda (Koyî 2004, 115)

Dîsa em di helbestên Cegerxwîn de jî weke rexneyên Koyî rexneyên şêx û meleyan dibînin.

Heta îro nezan bûm  
Di nav koma dîzan bûm

Li pey şêx û mela bûm  
Li çol û kerbela bûm

Em derkevin ser şaxan  
Guh nedin şêx û axan

Xwendewarên şoreşger  
Xortên zana û camêr (...)(Kurdo serê xwe rake, Dîwana 8an)

Em dibînin ku sedema derengmayîneke modernîst, ji nebûna serbixweyî ya neteweyan e. Li jor me behsa wê kir. Dewletbûn wek hêzeke navendî rola rêbertiyê ji neteweyan re dike. Bi vê hêza xwe, hewcebûnên xwe yên leşkerî, aborî, perwerdeyî û bûrokratîk dibîne û ji bo ku van ava bike dixebite. Pişt re ji bo naskirina modernîzm û pêşketina welatên Ewrûpî, rewşenbîr ronakbîr û zanayên xwe dişînin wan deran. Wan kesan piştî vegera welatê xwe di her warî de hewldana modernbûna gel kirin. (di serdema destpêka meşrûtiyeta duyemîn ya Osmaniyan de gelek rewşenbîr bi vê mebestê hatine şandin bo welatên Ewrûpayê) Ev yek bi hebûna dewletbûne pêk anîn. Ji xwe wateya modernîzmê yek jê jê ev e.

Modernîzm çawa ku nêrîneke nû, ruhekî zindî dide wêjeyê, pêwîste wêje jî bi ruh û nêrîna nû bandorê li ser wê civakê bike. Lê modernîzebûyîna neteweyan bê

bingeh nabe. Ew li ser bingeha çand û wêjeya netewî tê pêk anîn. Pêk anîna wê bi metodên nû, bi şêweyên nû çêdibe. Ev şêweyên nû metodên nû ji xwe modernîzm e.

Modernîzm ne tenê şêwe û metodeke nû ye. Di heman demê de jiyaneke nû jî ji bo neteweyan amede dike.

Em zanin ku bi modernîzmê li Ewropayê serdemeke nû destpêkir. Lê ev serdem ne tenê serdemeke ku metod û teşeya wêjeyê guhert. Armanca teşe û metoda wêjeya nû ew bû ku jiyaneke jî modernîze bike. Hinek neteweyan ev serdem bi serfirazî pêşwazî kirin û gihîştin armanca xwe, hinek neteweyan jî îmkanên vê serdemê dereng man, lê di dawîyê de ew jî bi serketin û hinek neteweyan jî hem di vî warî de dereng man hem jî bi serneketin.

Piştî ku şoreşa frensî û şoreşa pîşesaziyê destpêkir bi taybet li Ewropayê tevgerên netewperiyê jî destpêkirin. Di demeke kurt de ev tevger li cihanê belav bûn. Bingeha tevgera netewperiyê bi rastî wêje bû. Bi saya wêjeyê, rewşenbîran hestên gel dihejandin û ew bi ser netewperiyê ve vediguhastin. Ji ber vê yekê modernîzma neteweyên Ewropî modernîzmeke cewherî bû ango pêşnimûne (prototîp) bû. Modernîzma welatên derveyî welaten Ewropî jî weke Jusdanîs aniye ziman modernîzma derengmayî ye. (Jusdanîs 1998, 11) Di vê astê de em dikarin bêjin hemû modernîzmên xeynî welatên Ewropî derengmayî ne. Di rojhilata navîn de sedema derengmayina modernîzmê yek jê ew bû ku gorî hinek rewşenbîrên Rojhilatî fikr û saziyên Ewropî wek “jixwe dîrketin” û “bêkokbûn” didîtin bû. Alan, di derheqê vê nêrîne de fikra Alî Şerîatî diyar dike ku ew dibêje: “medenîkirin”ê bî xwe re du encam anîne, yek pişaftin e yek jî biyanibûna ji koka xwe ye”. (Alan 2015, 49) Bi taybet ev nêrîn nayê piştguhkirin. Ji bilî sedemên dîtîr, ji ber vê sedemê jî neteweyên Rojhilatî li hember modernîzmbûnê bêdil in. Lê dema ku em li modernîzma kurdîya derengmayî dinêrin ev sedema ku li jor ji bo neteweyên Rojhilata navîn me behs kir, ji bo kurdan pir ne derbasdar e. Ji ber ku hê kurd wekî ew neteweyên rojhilatî ne xwedî mafên xweyên netewî ne. Di vî warî de xeynî kurdan hemû neteweyên Rojhilatî xwedî her mafekî xweyî neteweyî ne.

Tezahûrên modernîzma prototîp bazara hevbeş, qelsbûna desthilatdariya olî, pîşesazîbûn û desthilatdariya civateke burjûwazî ye. Di modernîzma derengmayî de sedema biyanîbûnê wek Jusdanîs jî dibêje ne parçebûna civatê ye belkî kêmbûn an tunebûna tezahûrên modernîzma prototîp in.

## ENCAM

Wêje, wek tê zanîn ji bo mirovahiyê berheman hildiberîne û hîmê xwe ji jiyana civakê distîne. Berhemên wêjeyî jîndar in, ji nav jiyana însanan û ji xeyalên mirovan tîr çêkirin..

Berî ku wêjeya modern ango nivîskî destpêbike wêjeya devkî xurttir bû. Lê piştî modernîzmê wejeya nivîskî xurt e, pêşketî ye.

Wêjeya modern ne wek wêjeya klasîk e. Di wêjeya Modern de realîzma modern li ber çavan û li pêş e. Ji ber wê yekê wêjeya modern , aktîf e, bi bandor e, hîn dike. Wêjeya realîst ya modern, bûyerê, mewziyê, waqiyê wek xwe, di nav herikandina bûyerê de datî e.

Du merhaleyên bingehîn ya edebiyata neteweyî heye. Yek jê edebiyata klasîk e, ya din jî pêk anîna edebiyata modern e. Gotin berî nivîsê ye. Serkaniya edebiyata kurdî, edebiyata devkî ya gelêrî ye. Nivîskarên edebiyata devkî dengbêj, çîrokbêj û pîrejinên kurd in. Lêkolînavan Edward Saîd dibêje: “Berhemên edebiyata devkî di tesewira nasnameya netewî de xaleke girîng e.”

Wêje, çand û ziman ji bo neteweyiyê tiştên herî bingehîn in. Ji ber vê pêwîste her neteweyekî wêjeya xweya netewî hebe. Wekî me li jor behs kir wêje, di pêk anîna nasname û xwenasîna çandî û netewî de roleke erênî heye. Rewşenbîr û ronakbîr ji bo avakirina wêjeya neteweyî hewl didin ( weke me li jor jî behs kir ku bi navê “edebiyata millî” ekoleke edebiyata tirkî heye) .

Wêje rola derfetên jiyanî yê ku hestên yekitiya netewî dide kesan dilîze. Ziman û edebiyat ji bo nasnameya millî pêwîstiyên bingehîn in. Di pêkhatina netewebûnê de rola navendî dilîzin. Ruhê ziman û edebiyatê, hişmendiya edebî ya netewî dibe ruh û hişmendiya netewî. Ji xwe ev yek jî nîşanên modernîzmê ne.

Me di vê xebata xwe de modernîzm, modernîte û bandora wê ya li ser wêjeyê nirxand. Me dît ku wêje ji bo yekitiya netewî roleke pir girîng dilîze.

Bi hewldana Ehmedê Xanî fikrên mijara wêjeya modern destpê dike û bi şopdarê Xanî, Hacî Qadirê Koyî hîmê wêjeya modern a kurdî tê danîn. Koyî bi nêrînên xwe û bi berhemên xwe bandoreke girîng li ser kurdên Iraq û Îranê dike. Li aliyê dîtîr de bi ekola Hawarê qonaxek derdikeve pêş û di nav ekola Hawarê de bi mînak me rola Cegerxwîn û bandora wî ya heta îro jî li ser gelê heye nirxand.

Di nav kurdên Sovyeta berê de ango kurdên Qefqasyayê de, ekola Riya Teze heman peywirê digire li ser milê xwe û heta roja îro wê rola xwe bi awayekî pir baş dilîze.

Li aliyekî dîtir em dibînîn, piştî ku tevgera rewşenbîrî ya kurdan bi avabûna Tirkiyê vemirî û ket asteke windabûyîne, şopdarê Xanî Koyî û ekola Hawarê, kurdên dîasporayê ku li sirgûnê derketin qada rewşenbîriyê û dest bi xebatên xwe kirin.

Her çiqas ku rewşenbîr, zana û ronakbîrên kurdan li ber xwe dane jî mixabin ew pêk anîna modernîzmê bi cîh nebûye. Helbet gelek sedemên wê hene.

Bi ya min modernîzma kurdî ne tenê modernîzmeke derengmayî ye di heman demê de “modernîzmeke bindest” e. Ji ber ku modernîzma desthilatdaran li ser kurdan ferz bû ye. Wî çaxî modernîzma ku li ser kurdan ferz bûyî “modernîzma serdest” e, ya kurdan jî “modernîzma bindest” e.

Lê kurdên ku li Iraqê dijîn ji ber ku di destpêka sedsala 20an de xwedî rêvebiriyeke xweser in, di warê modernbûnê de ji kurdên ku di bin desthilatdariya welatên dîtir de dijîn pêştir in. Ev yek jî dide xuyakirin ku modernbûna netewekî bi giranî girêdayî serbixweyî û azadî ya wî netewî ye.

Bi kurtî em dikarin bêjin modernîzma kurdî modernîzmeke derengmayî ye. Çima derengmayî ye? Weke ku me li jor jî got, heke em modernîteya rojava pêşnimûne bigrin ku wî çaxî pirsar me tê bersivîn. Modernîzm di rojava (Ewrûpa) de bi bilindbûna kapîtalîzma aborî ve dest pê dîke. Ji bo pêşketina vê netewew-dewlet, civakeke rasyonalist û burjûva an jî çîna navîn lazim e. Di vê modernîteyê de takekesî derdikeve pêş û li hember ilm û fennê têkçûna otorîteya olî çêdibe. Bi kurtasî mirov dikare bêje sanayî û sekûlerî ji bona modernîteyê xurt pêwîst e.

Tiştê ku me li jor gotin yek ji wan hê jî di modernîteya kurdan de tune ye. Ne netewew-dewleta wan heye ne jî çîna wan ya burjûva heye ne jî kurd ji aliyê ilm û fennê de pêş de çûne û ne jî pîşesaziya wan heye. Di aliye din de bingeha modernîzmê di nava gel de jî tune û hê jî otorîteya olî têk neçûye. Hê li gelek welatên ku kurd lê dijîn zimanê wan qedexe ye.

Weke ku rewşenbîr û nivîskarên kurd di nav atmosfereke neasayî de dijîn û dinivîsin, rastî bişavtinekê hatin, ji ber vê berhem hatin veşartin guhdarîkirina muzîka wan qedexe bû, ji ber wan sedeman ketin girtîgehan, îşkence lê hatin kirin hwd. Pirsgrêka rewşenbîrên kurd ya yekem ne wêje ye, belkî zêdetir polîtîka ye. Ji

xwe modernbûna kurdî jî di destpêkê de modernbûneke siyasî ye ku hemû keda xwe bi hişyarkirin û serwextkirina kurdan de xerc kirin e û ji ber vê yekê nimûneyên edebî, di destpêkê de kêm in û hinek jî netemamkirî mane.

Dîsa em dibînin ku gelek rewşenbîrên ku bi eslê xwe ve kurd in bi zimanê tirkî berhem çêkirine lê ew berhem ji hesabê modernîzma kurdî de nayê hesabandin. Ji ber ku ew berhem xizmeta pêşdeçûna modernîzma tirkan dikin. Wek mînak rewşenbîrên navdar Yaşar Kemal bi eslê xwe kurd e, lê hemû berhemên xwe bi tirkî nivîsandine. Di ser de jî çavkanîyên berhemên wî bi piranî ji wêjeya kurdî ya devkî ne. Lê dîsa jî em nikarin bêjin xebatên Yaşar Kemal hewldanên modernîzma kurdî ne. Gelek mînakên wisa hene.

Sedema ketina wêjeyê ji bo xizmeta neteweperweriyê ew e ku wêje, neteweyan bi dîrok û xaka gel ve bi hêsanî bi hev re girê dide. Di aliyê dîti de jî wêje xwedî kapasîteya pêvekirina sembolên netewî bo jiyana gel ya rojane ye.

Kengê ku modernîzma kurdî bû xwedî taybetmendiyên modernîzma prototîpî (me li jor behsa wan kiri bû) wê çaxê em dikarin bêjin dê modernîzma kurdî jî hêdî hêdî ji derengmayîne derbikeve û bibe modernîzmeke pêşnimûne bo kurdan.

## ÇAVKANÎ

- Alan, Ramazan. «Li ser çend taybetiyên edebiyata kurdî ya modern.» <http://diyarname.com>. 08 Şubat 2014. <http://diyarname.com/news.php?Idx=8046> (Ocak 12, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- . «Li Ser Çend Taybetiyên Edebiyata Kurdî ya Modern.» <https://zimanuwejeyakurdi.wordpress.com>. 2014. <https://zimanuwejeyakurdi.wordpress.com/category/weje/> (Ocak 20, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- . Zanista Wêjeya Modern. Istanbul: Peywend, 2015.
- Aydoğan, İbrahim Seydo. «Romanên Mehmed Uzun.» <http://www.kurdigeh.com/>. Romanên Mehmed Uzun. <http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/Li%20ser%20se%20romanen%20Mehmed%20uzun.pdf> (Ocak 15, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Çetin, Süleyman. «Kovara Hawarê û Bandora Wê Ya Li Ser Zimanê Kurdî.» <https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp>. 2016. <file:///C:/Users/Casper/Downloads/458825.pdf> (Ocak 8, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Çetintaş, Mesut. «EDEBİYAT VE DİLİN TOPLUM ANALİZİNDE.» <http://dergipark.gov.tr>. 2010. <http://dergipark.gov.tr/download/article-file/378434> (Aralık 15, 2017 tarihinde erişilmiştir).
- Ergün, Zülküf. «Gotara Dîjkolonyal Û Wêneyê Serdestiya.» <https://www.academia.edu>. Mart 2015. [https://www.academia.edu/11040329/\\_Gotara\\_D%C4%B1jkolonyal\\_%C3%9B\\_W%C3%AAney%C3%AA\\_Serdest%C4%B1ya\\_T%C4%B1rkan\\_D%C4%B1\\_Kovara\\_Hawar%C3%AA\\_De\\_Z%C3%BClk%C3%BCf\\_Erg%C3%BCn\\_](https://www.academia.edu/11040329/_Gotara_D%C4%B1jkolonyal_%C3%9B_W%C3%AAney%C3%AA_Serdest%C4%B1ya_T%C4%B1rkan_D%C4%B1_Kovara_Hawar%C3%AA_De_Z%C3%BClk%C3%BCf_Erg%C3%BCn_) (Ocak 23, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Gurdilî, Ali. «Modernîzm (Nûjenparêzî).» <http://krd.riataza.com>. 28 Aralık 2016. <http://krd.riataza.com/2016/12/28/modernizm-nujenparezi/> (Ocak 20, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Hassanpour, Amîr. tarih yok.
- . Li Kurdistanê de Ziman û Netewperwerî. Istanbul: Awesta, 2005.
- «Hawar.» <https://www.kurdipedia.org>. tarih yok. <https://www.kurdipedia.org/files/books/2014/115693.PDF?ver=1305491215009469> 11 (ocak 15, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- «Hawar.» <https://www.kurdipedia.org>. tarih yok. <https://www.kurdipedia.org/files/books/2013/88768.PDF?ver=13023750284194797> 7 (Ocak 15, 2015 tarihinde erişilmiştir).
- <https://ku.wikipedia.org>. 21 Mart 2017. [https://ku.wikipedia.org/wiki/Mehmed\\_Uzun](https://ku.wikipedia.org/wiki/Mehmed_Uzun) (Aralık 25, 2017 tarihinde erişilmiştir).

- <https://ku.wikipedia.org>, modernizm. 12 rêbendan 2015.  
<https://ku.wikipedia.org/wiki/Modern%C3%AEzm> (Aralık 20, 2017 tarihinde erişilmiştir).
- <https://tr.wikipedia.org>. tarih yok. <https://tr.wikipedia.org/wiki/Modernite> (Aralık 15, 2017 tarihinde erişilmiştir).
- <https://tr.wikipedia.org/modernite>. 5 Ekim 2017. <https://tr.wikipedia.org/wiki/Modernite> (Ocak 15 2018 tarihinde erişilmiştir).
- <https://tr.wikipedia.org/wiki/Modernite>. «Modernîte.» <https://tr.wikipedia.org>. 5 2017Ekim.  
<https://tr.wikipedia.org/wiki/Modernite> (Ocak 15, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Jusdanis, Gregory. Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür. İstanbul: Metis Yayımları, 1998.
- Koyî, Hacî Qadirê. Dîwan. Arstra/Sweden: Weşanxane Nefel, 2004.
- öztürk, İrfan. «Hîmên helbesta kovara Tîrêjê.» <http://eski.artuklu.edu.tr>. 2014.  
<http://eski.artuklu.edu.tr/Upload/tyde/Tezler/10105979.pdf> (Ocak 14, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Polat, Lokman. «Bandora Edebiyatê.» <http://webcache.googleusercontent.com/>. Eylül 2001.  
<http://webcache.googleusercontent.com/search?q=cache:LDaHdf74Mn4J:www.tirsk.net/danegeh/pirtuk/lokman%2520polat/bandora%2520edebiyate.doc+%&cd=7&hl=tr&ct=clnk&gl=md> (Aralık 20, 2017 tarihinde erişilmiştir).
- Sönmez, Vecihi. «Hecî Qadirê Koyî û Hizra.» <http://www.kurdipedia.org> hatiye girtin. 2015.  
<http://www.kurdipedia.org/files/relatedfiles/2016/97457/0020.PDF> (Ocak 10, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Turhanoglu, Ferhal Aşkin Koçak. Toplumsal Değişme Kuramları. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi, 2016.
- Uzun, Mehmet. Destpêka Edebîyata Kurdî. Ankara: Beybûn, 1992.
- «Wêjeya kurdî ya modern.» <http://diyarname.com>. 01 02 2014.  
<http://diyarname.com/news.php?Idx=8030> (ocak 10, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Xanî, Ahmedê. Mem û Zîn. Çeviren M.E Bozarslan. İstanbul: Gün Yayımları, 1968.
- Xelîl, Temûrê. «Rojnama kurdî ya here jîyandirêj — "Rya teze".»  
<https://krd.sputniknews.com>. 30 Nisan 2009.  
<https://krd.sputniknews.com/kurdish.ruvr.ru/2009/04/30/449486/> (Aralık 25, 2018 tarihinde erişilmiştir).
- Yuksel, Okan. «Modernizm ve Post-Modernizm.» <http://politikakademi.org>. 24 Haziran 2013. <http://politikakademi.org/2013/06/modernizm-ve-post-modernizm/> (Ocak 17, 2018 tarihinde erişilmiştir).

**T.C.**  
**Mardin Artuklu Üniversitesi**  
**Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**  
**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**  
**Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

**MODERN DÖNEMDE MODERN KÜRT**  
**EDEBİYATI VE KÜRT EDEBİYATI**  
**ÇERÇEVESİNDE GECİKMİŞ MODERNİZM**

**Hasan KOCAHAL**  
**13721093**

**Danışman**  
**Öğr. Gör. Zülküf ERGÜN**

**Mardin 2018**



**T.C.**

**Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı  
Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

**MODERN DÖNEMDE MODERN KÜRT  
EDEBİYATI VE KÜRT EDEBİYATI  
ÇERÇEVESİNDE GECİKMİŞ MODERNİZM**

**Hasan KOCAHAL**

**13721093**

**Danışman**

**Öğr. Gör. Zülküf ERGÜN**

**Mardin 2018**